

berbang

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

SAL 1
NOUR
YEQSEMB

HEJMAR 1
NOUR
15GULAN 1938

HAWAR

Qomela Qurdî * Revue Kurde

Armanç, Hawayê Xebat û Nivisandina Haware

Hawar dengê zaninê ye. Zanin xwe nasin e, xwe nasin ji me ve réya lelat û xwesiyê ve diqe.

Her qesê qo xwe nas diqe; diqare xwe bide nas qirin.

Hawar me berî her tistî heyîna zmânî me dê bide nas qirin. Lewma zo zmânî serî heyînâ a pîsin e.

Hawar jî pîve bi her tistê qo qurdanî û qurdî pê bendewar e, dê mijîl bibe. Tînê siyaset jî dûr e, xwe naixe siyasetê.

Hawarê siyaset ji civatîn welati re hîstîye. Bi siyasetê bila ew mijîl bibin. Em jî dî ward-zanîn, hiner û sinhetê de dîxîbetîn.

* * *

Awayê xebatê. — Qareqi qo biqare biçe serî, divêt jê te pronyiseq bêt çêqirin. Me pronyisa xwe ser bingehêن jérin léqiriye.

1 — Belavqirina Ellabêya qurdî di nav qurdan û hînqirina wê. Semînandinâ zmanazîna qurdî û bin bi bin di gomelê de belav qirin û pêşdetir di siqê, qitebê de deréxistin.

2 — Sehitîva zarên qurdî û berhevdel-anîna wan. Sehitî ser mîrovaltya zmanî qurdî digel zmanîn din ên art. Sehitî ser bingehên zmanî qurdî, ser diroq û awayê rabûn û pîsveqetina wi.

3 — Ber hevqirin giroq, çirçiroq û ber teşit laje û stranîn qurdî û birêve belavqirina wan.

4 — Semînadin û belavqirina diwananî qurdî. Bi van ve jînenigarîyen sair û mîroven bijarte jî dî bûn belav qirin.

5 — Sehitî ser reks û Keydeyîn stranîn qurdî.

6 — Sehitî ser her textil röziqîn qurdî û Qurdistanê, yîn zemone borî û yenîfrî û semînadinâ wan. Sehitî ser hatînen Kurdistanê û pis û sinheten qurdî.

7 — Dîroq û erdnigarî:

Sehitî ser tevayîyi dîroq û erdnigariya welate Qurdistanê û ser dîroqa esîran, berî, pîşî û wexle Mir-Seref de.

* * *

Awayê nivisandîmê — Di hekê zmanî me de hefa niho geleg list hatine gotin. I nav van gotinan de listinen rast û nerast ji hene.

Ez qo qurd û qurdmançman im û zmanî xwe rind dizanîm û mon ew bi best hest zmanîn din daniye ber hev, qitqîten wi hîrhînandîne; keydeyîn wi jî hev derîxistîne, diqarim ji biyantîn bêtir û kenetir debqera wi bidim xuyîn qirin û zanîn.

Zmanî me irû hem freh hem teng e. Freh e: Pi her tistî qo qurd pî mijîl bûne, dest dane wan, di wîwîrî de zmanî qurdî hing zmanîn din û jî binen bêtir pîs ve çoye, û qemiliye, û jî lu zmanîn qemeli bi sun de ne maye.

Teng e: Hergî qo ji qurdara re nenas manê û qurd pî mijîl ne bune, di wî wîrî de zmanî me rawestîyaye, pîs ve ne çoye, di cihê xwe de maye.

Lê zmanî me ji wan zmanan e, qo ber her tistî nuh, pîrsen nuh dizan û bîrîve pîrsen nuh ji wan car dibin.

Herweqtî xelqî Gellyî-Goyan, berî çordêh salon, gava liyare ditlin, tavil bîzare xwe balâste nav li qîrin. Ji lewre

Lêkolînek li ser

KOVARA HAWAR'ê

Rûpel 20

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federasyona Komelén Kurdistanê
li Swede

Ansvarigutgivare/Berpîrsiyar:
N. Kirîv

Redaktion/Redaksiyon:
**A. Tigrîs, Aso Germîyanî, Cemşîd
Heyderî, L. Cengîn, Hesenê Metê,
Mahfûz Mayî, M. Ali K., Rohat,
Temo Zêrîn**

Amadekarê Beşa Zazakî:
H. Diljen

Sättning och Layout:
Bavê Rojbîn, C. Heyderî, N. Kirîv

Adress:
**Box 45 205
104 30 Stockholm/Sweden**

Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Prenumeration/ Abonefi:
**Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr/år**

Annons/İlan:
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr

*Redaksiyon ne berpîrsiyara nîvisarên
bi tîmze an nîvîs û gotinêñ Federasyonê
ye. Nîvîsarêñ kai ji Berbangê re têñ
şandin, heke çap jî nebin, li xwedî
nayêñ vegerandin.*

**ISSN - 0281-5699
Sal: 9, Hejmar 6/90 (67)
Çiriya pêşin -1990**

Apec tryckeri-Stockholm

Naverok

Beşa kurmanciya jor	Rûpel
<i>Îro me Berbangeke pîralî divê, Vîldan Tanrikulu</i>	<i>3</i>
<i>Pîrsên civakî pîrsên kî ne? N. Kirîv</i>	<i>4</i>
<i>Kîra Xelîcê dikare peyman û peywendiyêñ nû bine Rohilata Navîn, M. Kîper</i>	<i>6</i>
<i>Li ser problemê xortêñ biyanîyan, Abîd D.</i>	<i>8</i>
<i>Koma Miletan 45 salî, Amadekar: M. Ali K.</i>	<i>10</i>
<i>Pîrsa Endametiye û Pêwendîya navxwe, Vîldan Tanrikulu</i>	<i>12</i>
<i>Hevpeyîn di gel Dr. Celîlê Celîl</i>	<i>14</i>
<i>Quncika Tenduristî: Serêg, Dr. Celadet Saîd</i>	<i>18</i>
<i>Lêkolîn: Kovara Hawar, Dr. Cemşîd Heyderî</i>	<i>20</i>
<i>Zimanê Çûkan, Keya ïzol</i>	<i>25</i>
<i>Guhêrandina berhemêñ zargotinî di çanda netewî de kadastrofeke mezin û girîng e, A. Tigrîs</i>	<i>26</i>
<i>Kûştina Mehsûm (Çirok), Lokman Polat</i>	<i>28</i>
Beşa zazakî (dimili)	
<i>Çi fil o çi gergedan o</i>	<i>30</i>
<i>Folklorê çorşmedê Madenî ra çend nimûney, Arêkerdox: H. Diljen</i>	<i>31</i>
<i>Xim Ximi</i>	<i>32</i>
Beşa kurmaciya jêr	
<i>Çapkirawî nuwe</i>	<i>33</i>
<i>Xwendinewew pêşkeşkirdinî kitêbek</i>	<i>35</i>
<i>Bangawazek</i>	<i>37</i>
<i>Emperyalîzm û kêşey(pirsa) kurd, M. S. Lazarev</i>	<i>39</i>
<i>Sûr, Ehmedî Şamlo, wergêr: Ferhat Pîrbal</i>	<i>41</i>
<i>Çirokî Tes, Sîyamend</i>	<i>48</i>
<i>Beşî pîzîşkan: Vayrosî hêrpîs: Dr. Berzan Bêkes</i>	<i>50</i>
<i>Cend wusheyek</i>	<i>51</i>
<i>Wergêranekey N. Razazî, Rizgar Xoşnaw</i>	<i>53</i>
<i>Kurdekan bêdengî dişkênin</i>	<i>54</i>
<i>Kurdikiran û yasay nawdewletan, Marif Umer Gul</i>	<i>57</i>
<i>Gotarı Şerko Bêkes</i>	<i>59</i>
<i>Çaw pê ketin le gel heval Selîm Cewher</i>	<i>62</i>

ÎRO ME BERBANGEKE PIRALÎ DIVÊ

Vildan Tanrikulu

Di hejmara 64'an a Berbangê de berpirsiyarê Berbangê N. Krîv bi pirsa "Berbangeke çawa?" dîtinê xwe li ser Berbangê diyar kir û bi vê awayê, bi têgihiştina min, xwest ku munaqşeyek li ser form û naveroka Berbangê veke.

Gelek vekirî ye ku munaqşeyen li ser form û naveroka kovarekê bingeha pêşvebirina wê ye. Ev yek, her wisa ji bo Berbangê jî derbas dibe.

Her çend jiyana çapemenî û rojnamevanîya kurdî ne hinde dewlemed, pêşketî û xurt be jî, bi ya min pîvanê bingehîn û giştî divê wekî destpêka dîtinê li ser Berbangê bêne girtin. Ev yek ji bo tesbitkirina perspektivên me pêwîst e, ne ji bo bicîhanîna sedî sed ya van pîvanan û armancêni jiyana Berbangê ku divê bêni bicîhanîn, ronî dike. Ji ber ku, bicîhanîna armancan di her aliye jîyanê de girêdayî îmkanen bi destxistî ne. Mirov dikare bi perspektifên xwe û armancêni xwe yêni ronî çarçewa xebata xwe tesbit bike.

Fonksiyona bingehîn ya karên çapemenî guhastina agahdarî, zanyarî hîs di navbeyna mirovan û civatan da ye. Bê guman her karên çapemenî bi van fonksyonan re, ku min bi kurtî binavkir, ranabe. Her karên çapemenî li gor armancêni xwe yek, du an jî tevahîya van fonksyonan bicîh tîne.

Bi ya min, Berbang, wekî organa Federasyona Komelêni Kurdistanê li Swêdê di rewşa me ya di vê demê de divê van hersê fonksyonan jî bi cîh bîne. Sedemêni vê yekî bi kurtayî ez dikarim bi vî awayî rîz bikim.

Berbang, wekî organa Federasyonê bê guman divê agahdarî, ci li ser xebatêni xwe û ci jî li ser bûyerên li welêt, li swêd û li dînyayê, bigihîne endamêni xwe û bi giştî civata kurd li Swêdê. Gelek vekirîye ku iroj, fonksiyona agahdariyê di vê çarçeweyê de bi rojnameyêni rojane an jî bi kovarêni hefteyî têni bicîhanîn. Û ev kar ji alî rojnamevanê profesyonel û bi îmkanen gelek

mezin û pêşketî têni birêvebirin. Ev tişt dibe astengek li hember bicîhanîna fonksiyona agahdarî ya Berbangê.

Her çend ev astengen li jor nîvîsandî hebin jî, bicîhanîna fonksiyona agahdariyê jibo Berbangê berpirsiyariyek giring e. Ev berpirsiyari bi rîya neqandina (hilbijartina) nûçe, bûyer û agahdariyêni ku aktualite û girîngiya wan hebin an jî aktualite û girîngiya wan, li gor dema çapkirina Berbangê, jibo xebata Federasyonê û bo kurdan bi giştî, wenda nabin bê birêvebirin.

Fonksiyona duyem ya Berbangê, ango kovarek ku zanyariyê di navbeyna endamêni civata me de biguhese, bi rîya weşandina lêkolîn, dîtin yan jî rasîti (fakta) yêni edebî, zimanزانî, kultûrî, dîrokî, civakî, siyâsî ûwd. tê bicîhanîn. Ji bo vê fonksyonen, ji spontanîte zêdetir programek salane pêwîst e. Redaksiyona Berbangê divê ji bo her salek programek hazır bike, babetan tesbit bike û alikarî ji pisporêni van babetan bixwaze. Ev yek jî, eşkereye ku, şertek girîng derdixe pêşıya me. Kadro û pisporêni van babetan de divê di karekî weha de bi kêmânî bi raman û lêkolînen xwe besdar bibin û alikariya ronîkirina civata xwe bibin. Bi ya min, eger Redaksiyonen Berbangê bibin xwedî programek, dê pêkanîna vê fonksiyonen ji bo Berbangê hêsanîr bibe.

Fonksiyona sêyem guhastina hîs e. Ev fonksiyon, zêdetir di berhemêni edebî de pêk tê. Lê belê ne tenê bi vî awayî, her wisa bi rîya bikaranîna perspektifek yek neteweyî di babeten cude de, Berbang, ji bo xurtkirina hîsén neteweyî di navbeyna kurdan de dê rolek mezitir bilizî. Bi vî awayî, Berbang wekî kovarek neteweyî û demokratik ji bo kurdêni ji her aliye welêt bibe platformek naskirin û guhestina hîs, serpêhatî û tecrubeyêni hevûdu. Her kurdek wellatparêz perçeyek ji herêm û jiyana xwe, pirs û hîviyêni xwe bikaribe di rûpelêni Berbangê de bibîne.

Berbang, bi van fonksyonen ku min bi kurtî taswîr kir, dikare û divê bikaribe rabe. Bê guman, iroj di civatêni pêşketî de, wekî di her qada jîyanê de, di jiyana çapemenî de jî dabeşkirina kar

û berpirsiyariyê (specialisering) pêşketiye û ev yek nişanek herî giring ya sewiya pêşketina wan civatan e. Ji bo her fonksiyon, babet an problemek civakî, aborî, rîexistîni ûwd. organ û sazgehêni cuda têni avakirin. Lê, bi ya min, bêyî ku ez di vê nîvîse de bikevî nav detayen sedemêni wê, rewşa me ya vê demê wekî Federasyon rî nade da-bekirina karêni çapemenî di maneya ku min li jor binav kir. Ji ber vê yekê jî, ez wekî ku heval N. Kirîv di nîvîsa xwe de diyar kiriye "Berbang, wekî kovareke civakî û kultûrî û Berbang, wekî organa Federasyonê" di vê demê de alternatifîn hevûdu nabînim.

Bi ya min, ev herdu alternatifîn divê hevdu temam bikin û her yek bibin perçeyekê ji Berbangâ ku rola xwe li gora armancen di destûra Federasyonê de hatine binavkirin, wekî organa federasyonê bi mijûlîya pirsên civakî, kultûrî, zanyarı û agahdarî yêni gelê Kurd de bicîh bîne. Xwendevan û rexnegirêni Berbangê jî berê dîtin û rexneyen xwe divê rewş û îmkanan û her wisa alternatif û alikariyêni xwe wekî xwendevan û xwediyyêni Berbangê, diyar bikin da ku dîtin û rexne roleke avakar (konstruktiv) bilizîn.

Bê guman, fonksiyona piralî ya Berbangê ku bi ya min iroj pêwîst e, ne tiştek ebedî ye. Federasyona Komelêni Kurdistanê li Swêdê wekî perçeyekê ji civata kurd, divê wekî rîexistinêni din, di civata Swêdê de bikaribe karêni xwe yêni çapemenî li gor babet û armancêni xwe dabsê bike. Ango, dil dixwaze û ji bo ku bibin civatek hin pêşketî pêwîste jî, di karêni xwe yêni çapemenî de organek ji bo agahdarî, yek jibo berhemêni edebî-kultûrî, yek jibo civakî-dîrokî-aborî, yek jî bo agahdariya civata Swêd û yêni din (bi swêdî, îngilizî) ava bikin. Lê, gelek eşkereye ku, dema em ne di wê rewşê de bin ku bi kêmânî her sê fonksyonen hatin binavkirin, bicîh bînin, îmkan û pêwîstiyêni dabeşkirina karêni çapemenî jî nikarin ava bikin. Ango, bicîhanîna van fonksyonan di rewşa iro de bo me, bo Berbangê şertek derbasbûna dabeşkirina jiyana çapemeniyê ye.



Pirsên civakî pirsên kê ne?

Nebin xwediye serketinê hêsan! (Amilcar Cabral)

Dema min di hejmara 64'an ya Berbangê de îşareta pirsê danî serê koşa rûpelekê, mebesta min ew bû ku ez bala hevalan bikşînim ser pirsên me yên rojane û berbiçav, li ser wan dîtin û peşniyazên xwe binivisînim. Her weha wekî gelek hevalê din vatinîya xwe ya piştgiriyê bi cî bînim ku em bikaribin bi hev re pirsên xwe çareser bikin. Çawa nebe, pirsên me, yên rojane û berbiçav dê her hebin. Û min bi pirsâ «Berbangeke çawa» dest pê kir. Lê, ji ber ku rastiya (rewşa) me ji halê çareserkirina van pirsan pirr dûr e, min heta çend hejmarê din dev ji wan pirsan berda. Diviyabû berê her tiştî li ser pirsên bingehîn, pirsên ku me ji halê çareserkirina pirsên xwe dûr xistine rawestim. Pirsên bingehîn pirsên metodik in. Ku ev çareser nebin şertê çareserkirina pirsên me yên rojane û berbiçav dê hîç peyda nebin.

Pirsên metodik di cumlekê de bi heft gotinê pirsê û fiileke (verb) basît derdikeve pêsiya me: Kî, çîma, kîjan pirsî, çawa, bi ci, li kû û kengî wê çareser bike? Ku em bixwazin, di kîjan warî de û ci pirs dibe bila bibe, çareser bikin, divê em beriya her tiştî heft pirsên metodik hel bikin. Û dîsa, ku em bala xwe bidin, fiila cumlê, kirin (çareserkirin) e, ne dîtin, ne gotin û ne jî nivîsandin e! Eger ji bo çereserkirinê nebe, çîma em ê, binivisînin, bixwînin, munaqşe bikin, rexne li hevdu bigrin û serê hevdu biêşinîn?

Ez ê li vir, cumla jorîn ya pirsên metodik ji hev bikim û yek bi yek lê binerim.

Kîjan pirsî? Pirsa ku ji dervayî frada me heye û li benda çarê ye.

Çîma? Bersîv armanc e, armanc bi xwe jî çareserkirina pirsê ye!

Kî? Kî ku xwediye pirsê ye, EW.

Çawa? EW çawa dikare, wilô!

Bi ci? EW bi ci dikare, bi wan!

Li kû? EW li kû dikare, li wir!

Kengî? EW kengî dikare, wê çaxê!

Hebûna pirsê (pirsa ku li benda çareya xwe ye), hebûneke berbiçav û rojane ye. Her weha ew bi xwe pirsa Kî tesbît dike û armancê jî dixe pêsiya wan. Kî (EW) jî, ji ber ku berpirsiyarî û maf yên wî ne, divê bi xwe tenê bersîvîn çar pirsên din tesbît bike û li ser wan biryar bigre. Kîkilîta çareserkirinê ye, çunku EW(kî) bi xwe biryar dide û EW bi xwe pirsê çareser dike!

Li cem me Kurdan, Kî hê nebûye kilît, ji ber ku EW hê çetintirîn (dijwartîrîn) pirs e û hê li benda çareya xwe ye. Çetintirîn pirs e, çunku Kî'yê me heta nuha hay ji xwe nebûye û EW hê jî li bandewa biyanîbûnê de, her biyanîbûna xwe vedijîne.

* * *

Ji bo çareserkirina pirsên civakî yên Kurdên li Swêdê û ji bo piştgirîya têkoşîna gelê Kurd, bi perspektifek civakî û programeke maqûl, kêm be jî bi destûrek demokratik, bi

îmkanên baş û azad rêxistineke me bi navê Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê heye. Federasyon di deh salên xwe yên buhirî de, gelek xebatê hêja kiriye û di warê jiyana civakî-kultûrî de bi serayî hin hîmîn bingehîn pêkânîye. Di platforma Federasyonê de zimanê resmî kurdiye, danûstendin û xebat Kurdistanî ne. Bi ya min, ev wesif bi serê xwe tenê têr dikin ku meriv bibêje, Federasyon ji nuha de bûye nimûneyeke dîrokî! Ev alîyeke rastîye ye û alîyeke din jî heye: Eger hemû Kurdên li Swêdê, bi awakî lihevhatî, bi plan û proje di vê palatormê de bigihin hev, wê bi hev re xebatê baştir û xurtir bikin. Lê ci heye ku rastiya me ji vê yekê pir dûr e, ji ber ku em Kurd hê jî pirsâ xwe ya bingehîn, pirsâ yekîtiyê an jî bi gotine rastir, pirsâ bi hev re xebitînê hel nekiyîe.

Di dîrokê de tu carî yekbûna civaka Kurd pêk nehatiye. Dijminên Kurd her êrîs birine ser Kurdistanê û hukumdarîya xwe li ser wê domandine. Xelkê Kurd li hember zilm û zordariya dijmin her û her ber xwe daye, şerê azadîyê heta iro domandiye, lê disa jî yekîtiyeye giştî pêk nanîye.

Heta nuha bûyer û şertên dîrokî, Kurd kirine civakek û neteweyek, lê Kurd bi xwe û ji bo xwe nebûne civakek û miletek. Ev iro jî weha ye.

Di dîrokê de yekîtiyên civakî yên ku Kurd bi xwe pêk anîne eşîr in û loma ew ji bo xwe ji bûne eşîr. Loma eşîrî, perspektifek bo xwe, ruhek bo xwe, kulturek bo xwe, danûsitendinek bo xwe û «mafîn» bo xwe, heta iro parastiye û bi xwe re vejandiye. Di ser de jî, eşîrî damga xwe her li ser civakîbûn û millibûna me, xistiye. Lê divê em jî bir nekin ku eşîrî qonaxa pêşîn ya civakbûna insanetiye ye!

Xelkê Ewrûpayê rakirina sinorê xwe kirine rojeva xwe û yekîtiya Ewrûpayê, iro an sibê wê pêk bînin, lê me hîn rakirina sinorê eşîrî nedaye ber xwe ku em bi xwe û ji bo xwe bibin civakek û miletek.

Dîrokê em kirine civak. Pirsên me, mafîn me û navê me civakî (yanê yên civakekî) ne. Lê perspektîfa me, ruhê me û danûsitendina me û em bi xwe, nebûne civakî. Û loma herkes ji bo perça «xwe» û di «karê xwe» de ye. Loma em di bin navê xwe yên civakî (ser qissê xelkê Kurd) de, ji bo maf û pirsên xwe yên civakî, ne bi hev re ne. Loma, şûna ku em bi hev re ji bo her karî platformek pêk bînin, her yekîn me ji bo eyîn karî platformek pêk tîne.

Sedemîn vê yekê, ji rastiya xwe dûrketin (biyanîbûn-aleition) û heta derekê fîkrîn ideolojîk (zanînê biyanîbûyi) in. Dermanê vê yekê jî ne bawerî ye, fahmkirin (lêvarqilîn, jêhayhebûn) e. Anglo bi fahmkirinê em dê bikaribin pirsên metodik çareserbikin û rîya xwe vezin.

Û fermo, em bi hev re, ji bo ku pirsâ Kî'yê xwe hel bikin û bikin kilît, bersîva vê pirsê bidin: Pirsên civakî yên ku em dixwazin çaserbikin, ci ne û yên kê ne?

N. Kirîv

ŞER LI ERDÊ YE AN LI EZMÊN

Temo Zérin

Di buhrana Xelîca Îranê de çekên herî bikêr peykêن casusiyê yên emrikî ne. Peykêن li ezmên çavdêriya tevgera leşkerên iraqî, top û cebilxanê Iraqê dikin, depoxane, rê û rêçêن tunelên di bin erdê de hatine avakirin, bi aletinen nûjen, wêneyêن wan ji jor de tê kişandin. Ne mimkun e ku tiştek ji ber çavêن van peykan bireve; ne ewrê ezmanan û ne jî talda dar û berên heremê. Xwe di bin jêrzemîna erdê de vesartîn bêkêr e! Hêzên iraqiyan xwe nikarin ji van peykan vedizin, û nizanin bê kengî "çavên ezmên" li wan e.

Di roja me de bes tenê sê dewletên sereke xwedî peykêن leşkerî ne; Emrika, Sovyet û Çin. Li gor çavkaniyêniyi, Emrika pênc peykêن xwe yên dîdevanî û casusiyê li der û dora Xelîca Îranê civandine.


Didu ji van, KH-11, ji modelên kevn in û pir ne bikêr in. Kurtebêjeya KH, bi ingilîzî ye û kurtehiya bêjeya "Key-Hole" e ; mana "qula miftî" dide. Ji bilindiyekek çend deh-mîlî (mîlek 10 kilometre ye) dikare tiştekî 10 sentîmetrî mezin li ser ruyê erdê bibîne û wêneyê wî bikşîne.

Derî van herdu peykêن KH-11-an, du peykêن din yên nûnjentir ji hene, KH-12. Ev bi her awayî, ji alî mercek (optik) û parçen xwe yên elektronikî pêş da ne.

Peyka pêncemîn, peykeke bi rader e. Ev peykradera han Emrika sala 1988-an ber bi ezmên de şand. Wêneyêن vê bi qandî yên KH-an ne çak e. Lê wezîfa wê ji yên din pir cuda ye. Bi kurtî du karêñ girîng tîne cih:

1. Dema dunya ewr û tarî be an şil û sepeli be, ew dikare di wextekî welê de bê dijwari wêneyêن ruyê erdê bikşîne û bide me

2. Ü ya herî giring û diwem ji raberdayîna tebeqêن binerdê ye. Her çî xebat, tevdan û girêdanê binerdin ji wê xuya ye. Qenal, depoxane, cebilxane,



Kî dê zora kê bibe?

zad û zexire, gaz û bombeyêن di bin erdê de vesartî, bi gotineke din hemû tiştîn jêrzemîn ji vê peykê re nas û xuyader e.

Berî çendekî -meha oktoberî-, televizyona Swêdê, di bernama xwe ya "8 dagar" de, filmekî ingilîzî nimandi bû. Di wî filmî de peykên emeriikanîyan wêneyêن navçeyeke ji Kurdistan Iraqê kişandi bûn. Wêneyên vî filmî didan rû hin wêneyêن peykên welatên din û iştîmaleke mezin didan ku madenê uranium li Kurdistan Iraqê derdikeye. Li gor vê dîtinê ji xebatên çekirina bomba atomê gerek li van navçeyan ba. Ji vê navçeya çiyayî kurd bi dur hati bûn xistin bo bi hêsanî bikari bin xebatên xwe bi ewlehî bimeşînîn.

Pispor û zanayêن leşkerî hesabekî mezin ji vê navçeya Kurdistanê dikin û iştimala hebûna bomba atomê li vir dibînîn.

Derî van her pênc peykên emrikî, du peykên din ji Emrika şandine jor -36 000 kilometrî dûrî erdê-. Emrikanî ji her pênc peykên me li jor behsa wan kir bi navê "çavên ezmên" dinavînin. Ü ev herduyên dawîn ji bi navê "guhêñ ezmên". Ev herduyê han sehitîya dan û standinên pêlîn radyo dikin, xeberdânen têl û têlsizan dikşînin. Bi gotineke

din xeberdana iraqiyan ji di bin çavdêriyê de ye.

Saddam ne tenê Kuveyt her çavê xwe berda bû Erebîstanâ Suudî ji lê keys lê nehati bû! Biryara Emrika ya şandina çek û hêzên leşkerî bo parasîna Erebîstanê bi arîkariya deng û wêneyê van peykên casusîye mimkun bû bû.

Sovyet di ci alemê de ye?

Di buhrana ku li der û dorêñ Xelîcê de, peykên sovyetî ji viz û çerx dibin. Roja 2-ê tebaxê, gava Iraq kete erdê Kuveytiyan, roja din Sovyet peykek fi rand jor bo wênekişandina çûn û hatînêñ hêzên leşkerî. Ew ji hesabê xwe bi awayekî dikin.

Peykeke frensî ji heye bi navê SPOT. Şirketeke bi navûdeng e û bo ticaretê dixebite. Wêneyên herî baş ev peyka han dikşîne û difroşe dewletan. Pişî destpêka şerê Xelîcê, dewleta Fransê qedexe kir ku SPOT wêneyê der û dorêñ Xelîcê belav bike û bifroşe.

Ji vê kurtenivîsê dixuye ku şerîn navbera dewletan ne tenê li erdê her li ezmên ji berdewam e. Ku em şerê noqarêñ behran ji bihesibînin, şer û hebabîn li ser ruyê dunyê di sê war û cephan de didome. De îcar ka em kurd li kîjîn şerî de ne û li ku ne? ●

Krîza Xelîcê dikare

peyman û peywendiyên nû bîne Rojhilata Navîn

M. Kiper

Di 8'ê Çiriya Pêşin de li Qudusê bi destê Îsraîlyan 21 filistîni ji gîyanê xwe bûn. Pişti vê êrişê, awirêng dengê giştî yê cîhanî ji ser Iraq û Kuveytê vegeryan ser Îsraîl, Filistîn, Yekîtiya Miletan û Dewletan Yekgirtî ên Amerika.

Rêveberiya Beesa iraqê û diktatorê wê yê devbixwîn Saddam Husêن, dixwaze nakokiya Ereb-Îsraîl, ji bo şkandina eblûqeya izolebûna xwe bi kar bîne; wî gef li Îsraîl xwarin û got: roboten dûravêj ên me digihin heta hundire Israilê û ger roj hat, em xwe ji bikaranna wan nadîn paş'

Van heyamên dawî di çapemeniyên dinê de li ser êrişa hvv a Israilê, di derheqa awayê tewrê DYA û rojavayê gelek tê peyivin.

Li hember vê êrişa Israilê bê dengmayin, wê di dinya Ereb de dawiya pêbawerbûn û siyaseta bo DYA û welatên rojava bi xwe re bîne û daxwaza wan a ji cîhana Ereb izolekirina Iraq û Saddam Husêن neçe serî.

Hingî jî wê politikaya ji 2'ê Tebaxê û vir de li dijî Saddam Husêن tê ajotin, iflas bike û Saddam Husên wê di politika xwe ya dagir û ilhaqkirina Kuveytê de bi ser keve. Lî eger DYA û Ewropa Rojava li hember Israilê nerazibûna xwe xuya bikin, wê bikaribin li dijî dagirkirina Kuveytê, piştgiriya welatên ereb û hêzên din bistînin. Di vî warî de DYA û Ewropa Rojava ji îmtihanek ciddî derbas dîbin.

Li gor gotina hinekan bûyerên dawîn ên li Qudusê bi wê mebestê ye ku bala dinê ji Iraqê, bibe ser problemen Isra-

il-Filistînê. Weha bibe û nebe jî, li holê pirsek heye. Pêwist edi vî warî de mirov xwedî politika û tewirekî be û divê ew politika û tewir jî pêbawer be.

Bê guman ji alîyê Saddam û lêxwedîderketina pirsa Filistînê ku bi salan ji bîr kiribû, durustiya wî xuya nake. Lî ev politika wî ku dixwaze pirsa Filistîn û Kuveytê bi hev girêde û tev têxe nav mineşê û hel bike, zorê dide DYA û Ewropa Rojava. Piştgiriya PLO ji bo Saddam Husên, ji mesela pirensîban zêdetir, li menfeata Filistîniya ye. Di pirsa dagirkirina Kuveytê de cihan li ber deriyê şerekê mezîn e, lê di pirsa dagirkirina Filistînê de DYA û Rojava li ser beyanekê nerazibûna ji Israilê nagîhin hev.

Wekî diktatorê Iraqê Saddam Husên, DYA û welatên rojava jî li hember pirsa Filistînê hesasîyeta pêwist diyar nekiriye; ji bo çareserkirinek adîlane ya vê pirse nexebitîne. Heta her tim û bi ser hemû tiştan re wan li cam Israilê ci girtiye, piştgiriya wê kiriye.

Lî dema berjewendî û menfaatên wan ketine xeterê, ji nû lêxwedîderketina maf û azadiya mirovan, parastina wan mafan, hatine bîra wan. Di pirsgirêka Kuveytê de politikaya DYA, Ewropa û Japonia delîlên zelal ên me ne.

Tê zanîn, DYA û Ewropa Rojava bi salan welatên Ewropa Rojhilat bi nebbûna azadî û mafîn mirovan, bi sistêmîn diktatorî gunehkar kîrin. Ü ji bo hilwesandina pergela wan welatân ci ji destêwan hat, kîrin. Lî li alîyê din hem DYA hem jî Ewropa Rojava bi

diktatoriyyê li cîhana kapitalist re danûsitendinê xwe pêşxistin. Çek û cebilxane dane wan, li wan welatan ji bo guvaştina azadî û mafî demokratik tev imkanên xwe pêşkêş kîrin. Iraq xwedî leşkereke yek milyonî, xwedî çekêngiran ên kîmyayî û biyolojîk û roboten dûravêj, yek ji wan diktatoriyyê serekî bû.

Li Rojhilata Navîn û li Iraqê tu cara mafîn demokratik û însanî û têkoşîna netewî ya gelê Kurd berê qet nehatibû bîra DYA û Rojava. Ji ber vê yekê hessasiyeta wan li hember bûyera Kuveytê ne bê mane ye.

Lî ji ber ku heta niha DYA û welatên Ewropa Rojava li dijî têkoşîna gelan, ya ji bo cîhaneke adîl, xwedî politikayeke dijminkarî bûne; û di mesela Kuveytê de jî li hember politikaya DYA û Ewropa Rojava derketin ne karê tevgera Kurd e. Biryarê ku Yekîtiya Miletan sitendiye, bê guman biryaren meşrû ne, divê Kurd li ser van biryaran munaqeşe nekin. Lî problemen welatên Rojava Ewropa û DYA mumkun ku, parastina van hîn zehmetir be. Lî cardin jî, dema ew welatan li dijî işgal û ilhakkrina Kuveytê derdi Kevin û serxwebûna Kuveytê diparêzin, bi baweriya min pozisyonek bi heq û xeteke rast diparêzin. Mirov dikare li ser dilsozbûna wan an jî ne dilsozbûna wan dûr û dirêj bisekine û dîrok û kîrînên wan di vî warî de analîz bike. Pirr mumkun e ku di dîroka wan de gelek kîrinên qirêj hebin. Pirr mumkun e ku politika wan a navnetewî li ser îlhak û dagirkirina pêk hatibe. Lî disa ji dema ew dewletan li dij dagirkirin û ilhakirina Kuveytê derdi Kevin û dixwazin Iraqê ji Kuveytê derxin, politikayek rast û bi heq diparêzin û didomînin. Rast e, DYA bi xwe katibû Granada û Panamayê, lê dema ku iro DYA li dijî dagirkirina Kuveytê derdi keve, ew ê rojêne pêşde nikaribe wekî rojêne borî, bi hewqas gengazî êrişê hinek welatan bike û wan dagir bike. DYA wê mecbûr be ku di xeta xwe ya iro de bi istîkrar bibe. DYA û Ewropa Rojava jî dikare hinek cara xeteke rast biparêze û ew xet dikare li gor menfaeta wan be jî. Nabe ku Kurd xwe bixin xefleta parastina Saddam Husên.

Evkirîza dikare dawiya Saddam Hu-

sên bîne û ji bo Irakê û gelê Kurd alternatifînuh bîne rojevê. Rewşa iro li Rojhilata Navîn bê îstîkrarî peyda kiriye. Bê îstîkrarî dikare bibe sedama hilweşandina statuqoya Rojhilata Navîn ku gelê Kurd çar perçê kiriye. Di perçekirina statuqoya iro de dikare mumkun bibe ku li Rojhilata Navîn rewşeye nuh, peywendiyênuh û ittfakênuh peyda bikin. Di van peywendî û ittfakan de tevgera Kurd jî dikare bibe alîyekî. Peywendî, ittifak û peymânen ebedî li cîhanê tunene. Li gor şert û rewşen nuh, peyman û peywendiyênuh têñ holê. Keseñi jî, her tim ne dijminê gelê Kurd e. Van salêñ dawî nişanê me dan ku, dost dikare bibe neyar û neyar jî bibin dost.

Helbet hesasiyeta DYA û welatêñ Rojava nayê wê manê ku êdî wan dev ji kedixwariya emperyalist berdane, yan jî tilîyênuh xwe naxin nav karê hundirê gel û welatêñ din. Na, rastiye pir zelal e, ku di vî warî de serkaniyêñ mezin ên petrola li deverê, sedema herî girîng ya hessasiyeta wan e.

Encama bûyer û pêşketinaa dikare bibe sedema ji nû ve xîçkiririna xerîteya Rojhilata Navîn û di gel têkoşîna wî di be ku pêşeroja gelê Kurd jî bi awayekî rasterast girêdayî ve xîçkirina nû be.

Buyera Kuveytê welê kir ku; DYA, welatêñ Rojava û Yekîtiya Miletan, di derheqa pêşeroja Rojhilata navîn de bê dilê xwe angajeyê hinek pirsêñ nû bibin.

Edî pevgirdana nézik a pirsîrêkîn Rojhilata Navîn û ji bo vê jî pêwistiya konferansek navnetewî di nav wan de bû babetta munaqaşê. Serokê dewlata Fransa, François Mitterand yek ji wan kesan e ku li Rojhilata Navîn konferansek weha pêwistiya guhertinêñ politik ên nû anî ziman.

Italya weke ya Ewropayê, ji bo deve-re qala konferansek Ewlehiyê dike. Nûnerêñ Sovyetê ji bo çareserkirina problemê Rojhilata Navîn pêwistiya konferansek mezin a navnetewî dubare kir.

Tê gotin "di her şerekê de, xêrek heye". Li ber dagirkirina Kuveytê jî

bes ji bo pirsêñ Rojhilata Navîn munaqeşeya konferansek weha, an li darxistina wê, helbet gavek pozitif e. Di vî warî de DYA, Ewropa Rojava xwe di-din pêş ku wan mecbûr dike ku pêba-verbûna xwe nişana dengê giştî yê cîhanê û welatêñ ereb bidin.

Her çiqas konferansek weha, di destpêkê de, bixwaze tenê pirs û pro-belema Filistîn-İsrailê têxe rojeva xwe jî ez bawer nakim ku konferansek bika-ribe xwe bi pîrsa Filistîn-İsrailê ve bi sinor bike. Konferansek weha dikare pîrsa mafêñ Kurdan bike û wî têxe ro-jewê. Divê Tevgera Kurd jî, li hember suprîzên nû hazirbin, konferansa Kurd a ku li Stockholmê û bicive, dikare ji bo vê yekê bibe destpêka gavêñ ciddî. Bi şertêñ ku kurd bikaribin di vî warî de daxwazên xwe zelal û vekirî formule bikin. Divê Konferansa Stockholmê daxwaz û piştgiriya her gav û çalakî bike ku rê li ber Konferansek navne-tewî veke.

Lê divê bi giştî daxwazên Tevgera Rizgarxwaz a Kurd û bi taybetî yê Cepheya Kurdistana Iraqê berbiçav bin. Divê nûnerêñ Cepheya Kurdistana Iraqê dev ji gotin û beyanêñ ne wek hev berdin. Ü hêviya xwe li ser Seddam Husêñ girênedin. Bi ya min di hemû rewşan de, ev kirîza wê dawiya Seddam bîne. Ü kesenê ku hêviya xwe li ser wî girêbidin, wê bivê nevî ji encamê nasî-bê xwe bistînîn. Eger diktatorê Iraqê bi şer û ambargo neçe jî, wê bi têkoşîna gelêñ Kurd û Ereb de, di demek nêzîk de biçe. Icar mirov rabe kirâsa ku Seddam ci cara ne layiqî bûye, li wî xe, wê mirov rê li ber gelan winda bike. Ji ber hinek gotin û kirinan, li dijî DYA û Ewropa Rojava, Seddam Husêñ antî-emperyalist ilan kirin, bi tenê encama helsengandinê ser serve ye. Li gor min antî-emperyalist, berî her tiştî demokratbûn; siyaneta mafê demokratik û azadî girtin, humanîst bûyin, ji gelan hez kirin, li dijî kedixwazriya emperye-lîst û kolonyalîst derketin e. Seddam ku ji alîyê DYA û Ewropa hatiye xwedîkîrin û bi hêz kirin, bi hemû çekêñ kî-myayî û biyolojîk ve hatiye teqviyekirin, çawa dikare bibe antî-emperyalist? Ma antî emperyalistî, hewqas bûye bê rûmet? Di destpêkê de li Îranê desthilata meleyan xwest bi hin

kirinêñ xwe yên li dijî DYA û Rojava, xwe wek antî-emperyalist nişan bide. Lê bûyer û sal şahîd in ku antî-emperyalistî û li dijî DYA bûn, ne yek tiş in. Ji bo şkandina zîncîra izolebûnê dibe ku Seddam bixwaze hukumet û gelên cîhana Erebî li dor desthilata xwe bici-vîne. Dibe ku ambargoya Yekîtiya Netewan yan jî mudaxeleyek yekser ya DYA bibe sedema çûna Seddam Hu-sen. Di herdu halan de jî xwe li piş sloganêñ dijî hegemonya DYA li Rojhilata navîn vesartin û piştgiriya Seddam kirin, çewtiyek mezin e.

Mumkun e ku Seddam çawa xwedî li mesela Filistîn derket, wisa jî bixwaze dilê Kurdan xweş bike û bibêje "Eger Kurd li dijî biryareñ yekîtiya Milletan an jî li dijî DYA û Rojava li cem 'bray-ê xwe'yen Ereb cih bigrin (yani li gel Seddam bin) ez ê daxwaza Kurdan qe-bûl bikim". Divê Kurd bi polîtikayêñ weha ne yên xapandin û ji takîkîn weha re nebin alet. Seddam ne dilsoz e, iro ketiye tengesiye û dixwaze ittifaka li hember xwe belav bike.

Li Kurdistana Turkiyê kovarêñ Medya Gunesi û Deng jî ketin ber bayê Dogu Perînçek û desteka wî û di rojnama Cumhurîyet (17 Tebax 1990) de bi ilanekî li dijî şerxwaziya DYA û polîtika wê ya berfirehkirina hegemonya DYA derketin û awayek indîrek piştgiriya Seddam Husêñ kirin.

Lê wana tiştek ji bir kiribûn; DYA, ne iro, ji roja berê de ye ku li Rojhilata Navîn xwedîyî ittifakê xurt e. Turkiyê endamê NATO'yê ye, Israel bi her awayî piştgiriya DYA dike, Kuveyt, Irak Siudi Arabistan, Misir, Urdun hemû jî dostêñ DYA ne. Ji do ferqek heye ku DYA li Rojhilata Navîn ne xwe-diyeñ leşker bûn, lê iro xwedîyê leşker in jî.

Divê grûb û kovarêñ Kurd xwe nexin bin tesîra atmosfera grûbêñ çepê tirk ên marijnal ku di têkoşîna demokrasî û politik de qet giraniyekê wan tune ye.

Di krîza Rojhilata Navîn de giraniyek gotina kurd heye. Divê kurd xwe ji bayanêñ erzan û analîzêñ serviyî bidin paş. Her kirîzek li Rojhilata Navîn pîrsa Kurd bi xwe re dike aktuel û eşkere dike ku, bê çareserkirina pîrsa Kurd, li Rojhilata Navîn îstîkrar ne mumkun e.

12.10.1990


LI SER PROBLEMÊ XORTÊN BIYANYAN

Dema ku em li raporênis pîsporêni sosyalî û polisên Stockholmê binêrin, em ê bibînin ku ji sedî heftê kesen ku bi sûcê krîmînel radibin, xortêni biyanîne. Ev pîsporêni sosyalî, yên ku bi van xortêni xwedîni proplem re kar dikin, di beseke rapora xwe ya amadekirî de weha dibêjin: "Iro her ku diçe, hejmara van xortêni biyanî yên bi problem, zêdetir dibe. Ev xortêni ha, an di piçukiya xwe de hatine Swêdê, an jî li vir çêbûne û mezin bûne. Dema ku em dixwazin proplemen van xortêni ha li gor toreya civaka xwe çareser bikin, jê dêla ve ku baştıri bikin, xirabtir dabin û em jî nizanîn ku em ê ci bikin."

Li ser van raporêni pîsporêni sosyalî û munaqesen ku di çapemeniya Swêdê de bûn, li belediya Stockholmê buroya lêkolineren beşa problemen sosyalî, li ser sedemên van tişten ku min li jor qal kir, du lêkolînen xwe kirine û di van lêkolînen xwe de gêhîstine vê encamê: "Xebata me ya ku em Iro pê radibin û dixwazin hinek xortêni krîmînel û xiraben ku em bi navê -verşting- dinavînin, em wan disa bigêhînin civakê. Lî em dibînin ku ev xebata me bi ser nakeve. Lî li gel ku hemû rê û metodêni xizmeten sosyalî jî bi kar hatin, ev pirsgirêka çareser nebû û ev rastiyekê zelal e.

Bi gelemperek yên ku li Swêdê sûcêkrîmînel bikin û salê wan di binê 18'an de bin, mahkeme wan teslimê meqamên sosyalî dikin, ango wan rasterast zîndanînakin. Daxwaz û baweriya wan ji vê yekê ev e ku wan xortan bigêhîne û di nav civakê de disa bi ci bikin. Lî mixabin ev baweriya ha iro hêdî hêdî li wendabûnê ye. Xortêni ku bi karê krîmînelî radibin, dikevine girtîgehan; bîryarêni ku di vi warî de li mahkeman tene girtin zêdetir dabin.

Ji bo ku em sedemên hinek problemen xortêni biyanî baştıri têbigêhîjin, ez dixwazim bi nimûneyekê bidominim. Li ser vê yekê ez bi xortekî re peyivim. Di panzdehsaliya xwe de bi heban dest pê kiriye, dûre esrar û tişten weha bi



kar haniye û anuha jî bûye narkoman. Beriya ku em dest bi vê hevpeyivînê bikin, em berê hinekî li jiyanâ xort ve gerin û binêrin ka ji kîjan deveran re derbas bûye: Çawa bû ku ev xortê panzdehsaliî bû narkoman? Bavê vî xortî berê bi tena serê xwe hatiye Swêdê û pişti demekê jî malbata xwe aniye. Dema ku ev xorta tê Swêdê, hîna deh salê xwe jî tiji ne kiriye. Di hevpeyivîna xwe de, min ev bersivîn ha ji xort girtin:

- Ji wê dema ku tu hatî Swêdê, ka ci tê bîra te?

- Belê, dema ku ez hatim Swêdê, bajareki din bû (ne Stockholm bû). Her tiş ji min re xerib bû. Tişteku pir bala min dikişand, alênu ku li dora TEMPOyê (navê dikanek mezin e) li ba dibûn. Ez xwe bi xwe difikirîm û min digot: "Çima ev alênu ha?" Dûre ez têgêhîstim ku ev alênu ha ji bo reklamasyonê li ba dikevin. Wekî din jî tê bîra min ku me hemûyan bi malbatî dest bi ABFê (dibistana hînbûna ziman e) kir ku em ziman hîn bibin. Di vê dibistanede, danêsitandinê me tenê bi hevvelatiyê me re çêbûn. Tê bîra min ku pişti vê dibistana kursa zimên, min dest bi dibistaneke normal jî kir.

- Dema tu hatî vir, Swêdê, hîsên tê yên wê çaxê têne bîra te?

- Belê, hertiş ji min dûr û xerib bû.

Dilpekî û mereqa min pir bû. Ez li ser ne difikirîm ku ez ê bi ci awayî serkevîm û dibistanê biqedînim. Ez bi xwe jî nizanîm bê çîma ez li ser ne difikirîm. Li welêt hemû dersen min baş û geleki baş bûn. Di dibistanê de tu proplemekê min tune bû. Hertiş basît bû. Li malê (beriya ku werime Swêdê) ez wusa zede li ser dersen xwe ne disekinim, lê disa jî hemû dersen min baş bûn. Li welatê xwe, tenê di dersxanê de min guhdariya mamostan dikir û ev jî têra min dikir.

- Lî we ev rewşa dibistanenê welêt, li vir ne dît, ne wusa?

- Na. Li vir bi her awayî wekî din bû. Disiplîna dibistanenê vir, ji yên welêt cuda bû. Li vir kesekî di dersxanê de guhdariya mamostan ne dikir. Tevgeren çêlrûti û şûmiya xwendekaran atmosfera dersxanê diguherand.

- Baş e, di sala pêşîn de rewşa dersen te çawa bû?

- Xirab bû, an jî piçekî baş bû.

- Te ev rewşa xwe çawa didit?

- Ji mecbûrî min ev rewşa dihewand.

Dema ku ez dihatime malê jî, di malbatê de her kesî çeli proplem û dijwariyên jiyanâ li Swêdê dikir. Hemû kesen malbatê rîwiyêne rîyekê bûn. Ji ber vê yekê min nikari bû rewşa xwe ya dibistanê bi lêv bikira. Hertiş bi me hemûyan jî dijwar dihat.

Ev xortê ha, dûre dikeve nav refê xortêni swêdî yên xwedîni proplem û bi ava wan re diherike. Li ser vê yekê jî weha dibêje:

- Ez û van xortêni bi proplem weke hev in. Lewra ez jî weke wan ji pêşerojêni xwe bêhêvî me.

Bêhêvîtiya ku xwe li vî xortî diyardike, destpêka propleman e. Dûre çiqasî biçe ba psikologan û were jî, êdî bi kêrî tiştekî nayê. Lewra tu kesek ê nikari be dunya vî xortî têbigêhîje. Herweha ev xortê ha, pêwendiyêni xwe û narkomanen din xurtir dike, bi wan re digere, morfin, esrar û heşîşen ku ew bi kar tînin, ev xortê ha jî dikeve nav û ji wan



"Divê em bala xwe bidine ser daxwazên zarokên xwe û li gor daxwazên wan, wan bigêhînin. Ev daxwazên wan ci dibe bila bibe: Muzîk, ziman, dans, spor, kultur, huner ûhd... Divê em ji wan re bibine alîkar ku ew riya xwe bi destê xwe hilbijêrin ku bi ser kevin. Ji bo wextêr dirêj û rojêr dahatû, darê zorê tu carî nabe çareseriyeke pozitîv."

tiştan dibe xwedî par. Lê beriya ku were Swêdê, tu proplemeke vî xortî û van tiştan tune bû.

Ez anuha dixwazim ku bi nimûna jorîn re baştir proplemîn xortênu ku di zaroktiya xwe de hatine Swêdê, an ji li vir çê û mezin bûne, bi lêv bikim.

Di jiyanê de demêr xortaniya meriv, demêr herî girîng e. Di van çaxan de, vatiniya dê û bavan gelekî mezin e. Di vî salî de daxwaza dilê her xortekîye ku danûsitandina hawirdora xwe zêdetir bike, û ev ji bo wan dibe wek pêwîstiyeke pêwîst. Lê wusa diyar e ku xortênu biyanî di vî warî de raserî dijwariyan dabin û bi ser nakevin. Lewra li dibistanê bi pîvanen civaka swêdî fêrî jiyanê dabin. Dema ku tê malê ji pîvana malbatî li hebûna wî dicive û ev tişa dudiliyekê di wî û wê de ava dike. Wê çaxê ji ne dikarin xwe weke swêdiyekî bibînin û ne ji weke hemwelatiyekî xwe. Xortênu biyanî bi gelempêri dixwazin xwe weke siwêdiyan bidine xuyakirin. Lê ji ber ku ew bi rengdêra serreş têne navandin û piçûk dikevin, an ji kesen hawîrdor wan fam nakin, ev ji dibe sedem ku ji vê yekê bêpar bimîn.

Ev xotênu ha xwe wusa hîs dîkin ku li malê ji dê û bavê wan, wan fam nakin. Ev ji kuderê tê? Dema ku dê û bav bi pîvanen nava malê an ji bi normen we-

latê xwe nêzîki zarokên xwe dîbin, ev ji xortan re nabe bersîva daxwaza wan û wan têr nave. Lewra li derive, li dibistanê, li kuçê û di jiyana welatê Swêdê de, ew bi norm û pîvanen wekî din mezin dîbin. Bi kêmânî wan norm pîvanan bi çavên xwe dîbin. Wexta ku du form, du norm û du pîvanen cuda cuda li wan bicive, krîza xortaniyê ji ji van bo xortênu biyanî dibe proplemeke mezin û xwe li wan dide der. Xortênu weha bi tevayî xwe tenê hîs dîkin û dikevine psikolojiyeke tenêtiyê.

Di hinek rewşan de ev xortênu biyanî raserî berpirsiyariyê mezin ji tê. Bo nimûne: Di meqamên resmî de ji dê û bavê xwe re tercûmâniyê dîkin, an ji dagirtin û tijîkirina gelek kaxez û blancketen karê brokrasiyê dikevine ser milen van xortan. Dibe ku ev proplemeke sivik be. Lê dema ku meriv bifikire: Xortek hertim sermiyantiyê ji mezinê malê dipê, lê di rewşan weha de vatiniya mezin û piçûkên malê cî diguherîne. Û herweha berpirsiyariya vê vatiniyê di wê gavê de dikeve ser milen xortênu biyanî û pirî caran ji wan re dibe weke barekî giran.

Me got ku dê û bavê xortênu biyanî bersîva daxwazên zarokên xwe nadîn. Ev yekâ ji dibe sedema nakokiyek mezin û di navbera dê-bav û zarokan de

dinepixe. Dê û bav ji dixwazin vê nako-kiyê bi rê û rîbazên toreyâ welatê xwe ji navînê rakin. Ev rê û rîbaz ji wek ku Xwedê ji dizane bi ço û repikan e, an ji bi disiplîneke hişk û bêkêr e. Anglo ji dêla ve ku bi wan re bipeyive û wan serwext bike, dest davêjine darê zorê. Ez nabêjim, dê û bav vî tişte ha bi zanetiya dike, nezane û ji nezaniya xwe dike. Anglo nizane bi awakî din nêzîki zarokê xwe bibe û serê wan zelal bike. Lewra ew bi xwe ji rîwiyeke vê riya bûn û ew ji bi vî awayê xwe hatin mezinkirin. Û ev metodênu ha, li gor dê û bavê weha tiştekî pir normal e. Li vir ne ku ez dê û bavan gunehkar derdixim, an ji nabêjim ku ew ji zarokên xwe hez na-kin. Ez naxwazim bila malbat dev ji kultura xwe ji berdin. Lê ez dibêjim ku, dê û bavê biyanî êdî şertên welatê nû qebûl bikin. Bi kêmânî qebûl bikin ku li weletekî biyanî dijîn. Ku bi zar û zimanekî xwes vê yekê ji zarokên xwe re bibêjin û wan serwexî cudayıya kulta-ru xwe û vî welatê nû bikin, zarok ê ji sibe rabe bi sarbilindî kultura xwe û kultura welatê biyanî bide ber hev, cu-dayiya di navbera wan de bibîne û ji herdu aliyan ji aliyan baş û xirab ji hev derbixe. Ku zarokên biyanî bi vî awayî mezin bibin û bibine xort, bi şessiyete maqûl û ew ê li biyanîtiya xwe ji xwedî derkevin.

Bê şik û bê guman zarokên me kur-dênu li Swêd ji ew ê raserî gelşen hinek propleman werin. Dijwariyên jiyana biyanîtiyê bandora xwe ê li me ji bike. Xwyî me kurdan e ku em hertişten xwe politize dîkin û dibe ku em zarokên xwe ji bi vî awayî bigêhînin. Lê li gor min, divê em di vî warî de gelekî şareza bin. Divê em bala xwe bidine ser daxwazên zarokên xwe û li gor daxwazên wan, wan bigêhînin. Ev daxwazên wan ci dibe bila bibe: Muzîk, ziman, dans, spor, kultur, huner ûhd... Divê em ji wan re bibine alîkar ku ew riya xwe bi destê xwe hilbijêrin ku bi ser kevin. Ji bo wextêr dirêj û rojêr dahatû, darê zorê tu carî nabe çareseriyeke pozitîv.

Abîd D. (Sekreterê Sosyalî)

KOMA MILETAN (KOM) 45 SALÎ

- Koma Miletan û saliya xwe dagirt. Di derbarê vê organizaşyona navnetewî, ku di dunyayê de mezintirînê organizasyona ye, heta nuha bi kurdî zêde tiştek nehatiye nivîsin û gotin. Digel em vî navî gelek caran di termonolojiya xwe ya siyasî de bikar tînin û digel ku ev organîzyon li qedera miletên weke yê me ji nêzîk ve dikare tesir bike, dîsa ji em vê organîzasyonê baş nas nakin.
- Bi sedema di Berbangê de weşandina peymana KOM'ê ya ji bo "mafîn zarokan" me hewce dît ku em çend rîzikan li ser KOM'ê



KOM bi dû xebateke dûr û dirêj de di sala 1945-an de li San Francisco (Amerika Yekbûyi) ji teref 51 welatên endam ve hatiye damezrandin. Berya KOM'ê organîzasyona "Yekitiya Welatan" hebû.

Eva di şerê cîhanê yê duyemîn de li hember Almanya, Italya û Japon hatibû damezrandin. Bi dû fesexkirina "Yekitiya Welatan" re di dunyayê de hewcadariya organîzasyo-

neke navnetewî ji bo dan û standina welaltên cîhanê bi hevre geleki bi xurtî xwe nişan dabû. Lê KOM li ser bingehê du armancê din ên girîng hatiye damezrandin. Yek jê ev bû ku KOM dê

PEYMANA KOMA MILETAN JI BO MAFÊN ZAROKAN

Di 20.11.1989-an de KOM'ê biryara vê peymanê girt. Cara pêşîn 20 welatên imze kirin ku vê peymanê qebûl dîkin. Di manga ilonê de ji gelek ji serokên welatên dunyayê li Newyork'ê (Amerika Yekbûyi) ci-vyan û meşrûbûna vê peymanê qebûl kirin. Berya vê KOM'ê di sala 1948-an de peymana "mafî mirovan" girti bû. Lê fikra ku ew mirovên hêj 18 salên xwe tijî nekirine, anglo zarok, hewceyî mafîn taybetî ne vê dema dawîn li ba KOM'ê zelal bû. Eva rastiyekî ku di nakokîyên siyasî, civakî an ji di afetên xwezayî de, ji mirovan zarok ew grûba pêşine ku tade û zerarê dibûne. Tecrûba welatê me gelekî vekirî vêya dide xuyanî-kirin. Ev peymana ji 54 bendan pêk tê, 54 bendên peymanê didin xuya-nîkirin ku rewşa zarokên dunyayê divê çawa be. Lewra em qismekî ji van bendan kurt dîkin û ji bo xwendevanên "Berbangê" pêşkêş dîkin. Ev bendên ku em di virde diweşînin bi kurtê naverok û daxwazên vê peymanê şorove dîkin.

Bend 1. Li gor vê peymanê, ew mirovên ku hêj 18 salên xwe tijî nekirine zarok têne hesibandin.

Bend 2. Ew welatên ku ev peyman qebûl kirine divê ew mafîn ku divê peymanê de şirove bûne ji bo her zarokî biparêz in û pêk bînin. Dîn (ol), cins, reng, seqetî, baweriyê dê û bavan û rewşa wan ya civakî divê di paraztina mafîn zarokan de bi tu şeweyî roleke xwe tunebe.

Herweha ev welatên ku peyman qebûl kirine dê zarokan li hember hemî neheqî, şeweyî tadeyê û cezakirinê biparêz in.

Bend 3. Hemî tiştên ku ji bo zarokan têne kirin, bîryarên ku têne girtin; ji ji hêla dê û bavan de û ji ji hêla daîrên fermî de divê "ji bo zarok ya herî baş" hergav bingehê van bîryar û kirinan be.

Bend 4. Welatên bi peymanê re, divê hewl bidin, mecal û imkanan çêbikin; ji ji hêla qanûnî û ji ji hêla karbidestî ve ku ev mafîn di peymanê de şirove bûne da bi cî werin.

Bend 6. Welatên bi peymanê re, divê

hewl bidin, mecal û imkanan çêbikin; ji ji hêla qanûnî û ji ji hêla karbidestî ve ku ev mafîn di peymanê de şirove bûne da bi cî werin.

Bend 7. Mafî her zarokî heye ku xwedî nav û himwelatîyekê be.

Ji ber vê dema ku zarok hate dunyê dê zûtirîn qeyd bibe.

...
Bend 9. Mafî hemî zarokan ku xwedî dê û bav bin û di nav famîlekê de mezin bibin. Ew zarokên ku digel dê bavên xwe najî dîsa ji mafî wan heye ku bi herduwan re têkilî deynin.

...
Bend 12. Mafî hemî zarokan heye ku nerîn û baweriyê xwe bi serbestî bi-bêjin. Mezin dê li zarokan guhdarî bikin û ewana cîdi bigirin.

...
Bend 15
Mafî hemî zarokan heye ku bibin endamên kîjan komela ku ew dixwazin. Zarok bi xwe ji dikarin komela damezrînin.

...

serekî cihanê yê sêyemîn bide sekinandin, ango di dunyayê de aşitîyê pêk bîne, û yê din ji ku dunyayeke baştirîn ji bo mirovan biafirîne.

Bi dû damezrandina xwe de bergê kar û xebata KOM'ê roj bi roj geştir bûye û di dunyayê de rola vê organizaşyonê girintir bûye. Nuha 159 welat endamên KOM'ê ne. Gelek ji van welatê ku dûre bûne endam berê tev kolonî bûn. Gelek caran dema ku nakoî di navbêna du welatan de derketiye nav û pirsa KOM'ê aktuel bûye. Lê kar û xebata KOM'ê ji vêya gelekî zêdetir e. İro organên KOM'ê ên kar û xebatê li hemî aliyên dunyayê hene. Ev organên aborî, civakî, tenduristî, kulturî, human û ên bo parastina xwezayê ne.

Helbet rola KOM'ê ya siyasî di dunyayê de ber bi çavtir e û eva jî divê cuda weke yek ji ew karê KOM'ê yê sereke bête hesibandin. Di vir de divê were gotin ku xeta KOM'ê ya siyasî di dunyayê de hergav li ser bingehê rastî û edaletê nebû ye. Ji ber ku tesira ew dewletê xurt weke Amerika Yekbûyî û Sovyetî li ser gelek biryaren KOM'ê bûye.

Lewra divê em ji bîr nekin ku gelek miletê bindest, cara pêşin dawa xwe bi reya vê organizasyonê di dunyayê de meşrû kirine. Her wusa Koma Miletan di jiyana xebata xwe de gelek peyman û biryaren baş jî girtine. Weke mînak ya bo "Mafê mirovan". Ji hêlekê ve jî weke miletikî bindest em ji her kesî bêtir hewcedarin ku gelek ji van biryar

û peymanen KOM'ê bijîn û di jiyane de pêk werin. Ji ber wê jî divê em ji vê xebatê agahdaribin û li van biryar û peymanan xwedî derkevin.

Li welatekî ku mafê mezinan tunebe behskirina mafê zarokan dikare dûrî aqilan were û bi raya min jî eva heta derekê rast û vekrî ye. Lewra ku em bi vê rîyê jî bikaribin zulm û zordariya li ser gelê kurd, rûresîya dijminen gelê kurd li cihekî weke Awropa bidine xuyanî kirin û rûresîya dujminen gelê kurd careke din berbiçav bikin... em dê cîma nekin?

Amadekar: M. Ali K.

Bend 22. Mafê hemî zarokên pena-beran bo alîkarî û parastinê heye. Ew mafê ku ji bo hemî zarokan derbas dibe ji bo zarokên pena-beran jî derbas dibin, dê li ser vî bingehî zarokên pena-beran bêne bergirtin û mamele kirin (behandas).

Ji zarokên pena-beran yê bi tenê re, alîkarî were kirin ku famîlya xwe bibînin û bigîhîn hev.

Bend 23.

Mafê hemî zarokên seqet heye ku jiyaneke normal bijîn. Hewweha mafê wan yê alîkariya taybetî bo hîndekarî û pêşketinê jî heye.

Bend 24. Mafê her zarokî yê nexweş-xanê û lênerîna diktor (mayene) heye. Hemî welatênu ku ev peyman qebûl kîrine mecbûrin ku li hember nexweşî û xizaniyê bixebeitin, hewl bidin ku mirina zarokan ji ber van sedeman kêm bikin. Jinêni bi zarok û yên ku nû bûne dayik xwedî mafê alîkariya dermîn, nexweşxanê û lênerîna diktor in.

Bend 27. Mafê hemî zarokan bo jiyanek û pêşketineke baş heye. Ango; ma-

fê wan yê xwarinê, cihê rabûn û raketi-nê (mal), ava paqîj û kîncan heye.

Benda 28. Mafê hemî zarokan yê hîndekarî, hînkirina pişeyekî û belaş cûyîna xwendegeha pêşin heye.

Her wusa, mafê hemî zarokan bo informasyon û şewirdariyê di derbarê hemî xwendegeh û sinetê di civatê de heye.

Bend 30. Li wan welatan kîjan ku lê eqiliyet û olên hene, dê ew zarokan ku tevî van grûban dibin, mafê wan heye ku bi serbestî jiyana xwe ya kultûrî û oldarî bidominin û zimanê xwe azad bikar bînin.

Benda 31. Mafê hemî zarokan yê listik û bêhnberdanê (betlane) û kînîn ji bo wextê vala heye.

Bend 32. Ew welatêni bi peymanê re ne qebûl dikin ku zarokan li hember karên zehme û ên ji bo tenduristiya wan bi xeter, biparêz e. Hemî welat divê ji bo ku zarokan bigrin kar, umrekî mînimûm tespit bikin. Herweha ji bo ew karên ku zarok dê têda bixebeitin divê wext û qaïdê kar jî bi qanûnê bê

tespit kirin.

Bend 37. Mafê hemî zarokan heye ku li hember işkencê, ceza û muamelân hov bêne parastin. Mafê hemî zarokan heye ku li hember cezayê mirinê û muebetê bîne parastin. Eger zarokek ku li gor qanûna wî welati dê bê hepis kirin, eva divê ji bo wextekî gelekî kurt be û di nav vê wextekî mafê zarok heye ku bi famîlya xwe re têkili deyne wan bibîne.

Bend 38. Mafê hemî zarokan heye ku li hember ser bêne paraztin. Li wan zarokan ku ji şerî zerar ditîne dê alîkarî were kirin. Mafê wan zarokan ku hêj 15 salên xwe tişî nekirine heye ku nebin leşker. Hemî welat divê giramiya xwe, ji wan qanûnen navnetewî re ku di ser de derbas dibin nîşan bidin.

Bend 42. Ew welatêni bi peymanê re ne berpirsyarin ku xelkê, mezin û biçûkan ji bend û prensibên ku di vê peymanê de şirove bûne, agahdarî bike.

PIRSA ENDAMETIYÊ

Ü

PÊWENDIYA NAVXWE

Vildan Tanrikulu

Di jiyana xebatên rêxistinî de peywendiyêndi navbeyna endaman û rêxistin bi xwe de cîhek gelek girîng digire. Peywendiyeck yekser û jîndar ne tenê bingeha pêşvebirin û xurtkirina xebatên rêxistinê ye, her wisa ji bo kontrola demokratik li ser organêñ hilbijartî û xebatêñ wan, şertek girîng e. Ji ber vê yekê ji, sazkinin û bikaranîna rê û navgînîn peywendiye di navbeyna endam û organêñ hilbijartî de, ne tenê berpirsiyariya organêñ rêxistinan, her wisa berpirsiyariya her endamêñ ku bi zanyarî û ji dil di nav rêxistinê de cîh girtiye, ye.

Di jiyana xwe ya deh salî de Federasyona Komelêñ Kurdistanê li Swêdê di vî warî de gavêñ gelek hêja avetiye. Ci firehbûna Federasyonê û ci jî bicîhanîna fonksiyonêñ organêñ hilbijartî ya Federasyonê li gel kêmanî û xeletiyêñ xwe di vî warî de nîşanêñ girîng in. Pirs û pirsgirêkên xebata Federasyonê iroj ji her demî zêdetir di nav Federasyonê de bi xwe têñ rojevê û li rîyêñ çareserkirina wan tê gerandin. Federasyon iro hîn vekirî bûye nişanek yekbûna neteweyî ya kurdan li Swêdê û bi avahiya rêxistinî ya navxwe bûye platformek demokratik ji bo çareserkirina problemen penaberî û neteweyî ya kurdan. Bê guman ev tiştîn hêja berhemêñ xebatêñ salan ya welatperwerêñ kurd li Swêd in. Lê gelek vekirî ye ku dema em li ser van berheman pal bidin, ji rewşa xwe razî bin û rewşa xwe têr bibînin nedikarin gavêñ nûñ ji bo pêşvebirina xebatêñ xwe bavêjin... „

„ Federasyon iro hîn vekirî bûye nişanek yekbûna neteweyî ya kurdan li Swêdê û bi avahiya rêxistinî ya navxwe bûye platformek demokratik ji bo çareserkirina problemen penaberî û neteweyî ya kurdan. Bê guman ev tiştîn hêja berhemêñ xebatêñ salan ya welatperwerêñ kurd li Swêd in. Lê gelek vekirî ye ku dema em li ser van berheman pal bidin, ji rewşa xwe razî bin û rewşa xwe têr bibînin nedikarin gavêñ nûñ ji bo pêşvebirina xebatêñ xwe bavêjin... „

ji bo herkesî divê diyar be ku rêxistinek ne tenê "nîşan", her wisa xwedî fonksiyon e. Ji bo bicîhanîna fonksiyona xwe divê peywendiya navbeyna organ û endamêñ Federasyonê xurttir bibe. Bi ya min divê organa Federasyonê, ango Berbang divê bibe pirek yekser di navbeyna Federasyonê û endaman de. Ev pir wê peywendî û bicîhanîna berpirsiyariyêñ du alî ya endaman û organêñ Federasyonê pêşdetir bibe.

Lê, mixabin em di avahiya xebata xwe ya rêxistinî de hê ne di wê sewiyê de ne. Ez li vir naxwazim li ser sedemên neavabûna vê pirê rawestim. Bi ya min ya girîng ew e ku mirov li ser pêwistiya avakirina pirê raweste û pêşniyarêñ xwe diyar bike. Ji ber vê yekê ji ez dixwazim bi çend pirs û bi bersivêñ wan dîtinêñ xwe diyar bikim.

Pirsên min ev in. Gelo çîma endamêñ Federasyonê ne aboneyêñ Berbangê ne, yan jî çîma naxwazin bibin

aboneyêñ Berbangê? Çîma lista endamêñ Federasyonê li gel adresêñ wan li Federasyonê tune ye?

Ji bo ku girîngiya van pirsan bê fahmkirin, agahdariyek li ser rewşa abonetî ya Berbangê pêwîst e. Li Swêdê hejmarêñ aboneyêñ Berbangê 635 kes in, ku ji van nêzî % 20 ne endamêñ Federasyonê ne. Berbang li Swêdê ji 195 sazgeh, rêxistin ûwd. cîhan re tê şandin. Li derveyî Swêd 468 kes û rêxistinan re Berbang tê şandin.

Ji van hejmarêñ li jor nîvisandî neticeyek vekirî derdikeve holê. Dema mirov endaman û malbatan bike yek û bijmîre, tenê nêzî % 20 ji endamêñ Federasyonê aboneyêñ Berbangê ne. Ev yek ekere ye ku kêmaniyek mezin ji bo me teva ye. Di jiyana her xebatêñ rêxistinî de ji xebat û encamêñ xebata rêxistinê bi rîya weşanêñ rêxistinê agahdar dibin û her wisa dîtin û rexneyêñ xwe bi vê rîya han digihînîn endamêñ din. Anglo weşanêñ rêxistinan, teybîti ji li welitek wekî Swêd, pirek yekser ya herî girîng e di navbeyna organ û endamêñ rêxistinan de. Her çend rewşa aboneyêñ Berbangê wekî li jor nîvisandî be ji, yek ji babetêñ herî girîn ya munaqeşeyan di kongreyêñ Federasyonê de dîsa Berbang e. Rexneyen gelek giran li Berbangê û li xebatkarêñ wê tê kirin, gelek daxwaz jê tê kirin. Lê hejmarêñ li jor nîvisandî ji diyar dike ku em bi xwe bi piranî berpirsiyariya xwe li hember organa rêxistina xwe bîcîh naynin.

Li hember ev rewşa berbiçav ku bi ya min rewsek gelek ne baş e, divê her endamêñ Federasyonê bifikirê û xwedî pêşniyaran be da ku em bikarîbin ev pirsa çareser bikin. Ez tu sedemek li pêsiya endamêñ Federasyonê nabînim ku nebin aboneyê Berbangê. Ji bo rêxistinek kemaniyek gelek mezin e ku ji

“...Berî her tiştî, yekkirina endametî û abonetiya Berbangê dê bibe pirek yekser di navbeyna xebatên Federasyonê û endaman de. Endamên civata kurd li Swêdê ji bûyer, dîtinên hevdu û xebatên Federasyonê yekser bibin xwedî agahdarî. Xebatek jîndar ya rêxistinî û çapemenî girêdayî endam û xwendevanên aktif û fireh e... ,”

4/5 ya endamên wê organa wê bidest-naxin û her wisa ji bo her endamên rêxistinê xeletiyek mezin e ku ew bi xwe insiyatif negrin û organa wê rêxistinê ku endamê wê ne bidest nexin, nexwînin û jibo belavkirina dîtin û rexneyên xwe bikar neyin.

Ji ber sedemên ku min li jor diyar kir, bi ya min ci organên hilbijartî ya Federasyonê û Komelên endam û ci ji' endamên Federasyonê bi giştî divê insiyatif bigrin ji bo ku her endamên Federasyonê bibe aboneyê Berbangê, ango abonetiya Berbangê bi endametiya Federasyonê ve bê girêdan. Li ser şeklê yekkirina endametî û abonetiyê û her wisa heqê endametî û abonetiyê, di vê nivîse de pêwistiya diyarkirina pêşniyarek nabînim û bi ya min pirsek teknikî ye ku bi hêsanî tê çareserkirin. Lê ya girêng encamên yekkirina endametî û abonetiyê ye ku ez bi kurtî dixwazim li ser rawestim.

Berî her tiştî, yekkirina endametî û abonetiya Berbangê dê bibe pirek yekser di navbeyna xebatên Federasyonê û endaman de. Endamên civata kurd li Swêdê ji bûyer, dîtinên hevdu û xebatên Federasyonê yekser bibin xwedî agahdarî. Xebatek jîndar ya rêxistinî û çapemenî girêdayî endam û xwendevanên aktif û fireh e.

Duyem tişt ew e ku hejmara xwendevanên Berbangê ku bi endamtiyê ve bê girêdan dê bibe bingehet gelek giran-bîha ji bo peydakirina imkanên aborî ku Berbangê ji her aliyê ve -naverok, form û dem- pêşve bibe. Bidestxistina imkanên derxistina Berbangê weki roj-nameyek 15 rojî yan ji hefteyî dê rîya dabeşkirina karêñ çapemenî ya Federasyonê ji veke.

Ya dawî, bi yekkirina endametî û abonetiya Berbangê, platformek fireh

û demokratik ku yekser di bin kontrola endaman de ye bê avakirin û di her babetê de endamên civata kurd li Swêdê bikaribin ji bo ronîkirina hevûdu û civata xwe bikarbînin.

Encamê van encama her ew e ku civata kurd li Swêdê di warê birêxistin-bûn û xebata ber bi alî armancê xwe de pêşve here û xurttir bibe.

Pirsa din, lista endamên Federasyonê li gel adresên wan e. Be guman ev

“ ...Federasyon nikare peywendiyek xurt û yekser bi endamên xwe re ava bike, dema endamên Federasyonê navnişanên xwe nedin komelên ku lê endam in, yan ji komel bi xwe lista endamên xwe li gel navnişanên wan nede Federasyonê. Mumkun e ku ev yek jibo gelek xwendevanên Berbangê tişték gelek xerîb be. Lê rastiya me ji ew yek e ku, iroj ji agahdarî û nameyên Federasyonê tenê “aboneyên” Berbangê para xwe digirin.... ,”

pirs pirsek rêxistinî ya navxwe ku yekser ne girêdayî karêñ çapemenî ya Federasyonê ye. Lê eşkere ye ku ev yek pirsek girêng ya avahiya rêxistinî ya Federasyonê ye. Federasyon nikare peywendiyek xurt û yekser bi endamên xwe re ava bike, dema endamên Federasyonê navnişanên xwe nedin komelên ku lê endam in, yan ji komel bi xwe lista endamên xwe li gel navnişanên wan nede Federasyonê. Mumkun e ku

ev yek jibo gelek xwendevanên Berbangê tişték gelek xerîb be. Lê rastiya me ji ew yek e ku, iroj ji agahdarî û nameyên Federasyonê tenê “aboneyên” Berbangê para xwe digirin. Ji ber ku her çend lista endaman ji komelan hatibe xwestin ji heta iroj tenê 4 komelên endam bersîva vê daxwazê bi awayek pozitif dane. Li ser vê daxwazê gelek cara pirs hatine kirin ku Federasyon çima lista endaman li gel navnişana wan dixwaze? Ez dixwazim ev pirsa han vegerînim û wanî bipirsim. Çima endamek rêxistinê weki Federasyonê nav û navnişana xwe nede rêxistina xwe û li gel vê yekê daxwaza peyvendiyek jîndar bike? Bi ya min bersîvîn van pirsan di nav wan bi xwe de hene. Eger pirs girêdayî baweriye be, bi ya min berî her tiştî, jibo rêxistin bi xwe tu sedem tune ye ku bawerî, bi kesen ku navnişana xwe nadîn, bîne. Ev yek tenê aliyek pirsa lista endaman li gel navnişana wan e ku pêwistiya ronîkirinê heye. Weki din bi ya min girêdayî sistîya jiyana rêxistina ya me ye û ev sistî divê ji holê bê rakirin.

Ev herdu pirsên ku di vê nivîse de hatin munaqeşekirin, iroj di pêsiya xurtkirina xebatên Federasyonê de pirsên girêng in ku divê bêñ çareserkirin. Gelê kurd ji her kesî zêdetir, li her derê dinyayê û di her qada jîyanê de hewcedarê avakirin û xurtkirina sazgehîn neteweyî û demokratik. Û ev berpirsiyari ji bo kurdên ku li Swêd in bi pêşvebirin û xurtkirina rêxistina xwe ya demokratik li Swêd tê bi cih anîn. Ji ber vê yekê ji berpirsiyariya me teva ye ku li ser awayen xurtkirina avahiya rêxistina xwe bifikirin û gavêñ nûh bavêjin.

Dr. CELÎLÊ CELÎL :

- KUBARBÛNA HER MILETÎ YE KU ŞEKSPİR BI ZIMANÊ WÎ HEBE

Berbang: Mamoste, ji kerema re xwe tu dikarî ji me re bi kurtî qala jiyana xwe bikâ.

Dr. Celîlê Celîl: Ser çavêن min. Wek ku hûn dizanin em ji Erîvana bajarê Ermanîstanê ne. Bavê min eslê xwe ji Qersê, ji gundê Kizilkulê ye. Di wexta revê de hatine Ermanistana Sovyetê. Piştî ku şoreş çêdibe êdî li wir cîwar dibe. Lê sêwî mezin bûne. Xwinrijiya lesgerê romê xwe gîhandiye wir ji. Dê û bav, xîzm û nasêن wan giştik hatine kuştin.

Berbang: Apê Casim, beriya şoreşê hatiye, ne wusa?

Dr. Celîlê Celîl: Di sala 1918'an de hatiye. Wê çaxê li Rûsiyayê Şoreşa Oktôberê bi ser katibû, lê li pişt Qafkasayıyê hîn bi ser neketibû. Hersê cumhuriyetênu ku nuha hene dûre bûne sovyeti. Di sala 1918'an de bi serokatiya Kazim Karabekir lesgerê romê katine hidûdê Ermenistanê û li wir qetla kurdan tev ermeniyan hanîne. Dê û bavê min hêtîm mezin bûne û jiyana wan bi tevayî girêdayî jiyana Ermanistanê bûye.

Ez di 26'ê novembira sala 1936'an de ji diya xwe bûme. Di malê de ez zarokê duyemîn im. Nûxuriyê malê Ordîxan bû û piştî çar salan jî ez bûme.

Meriv dikare jiyana însan bi sê perdan veke. Gava meriv ji diya xwe çêdi-bê, di jiyana meriv de perda pêşîn vedîbe. Perda duduyan, destpêka jiyana meriv e. Perda sisiyan jî, bi mezin-bûna xwe ve têgihîştina jîyanê, naskirina derûdora xwe û nasîna xwe ye. Kî ye? Ci ye? Dibe ku di piçûktiya xwe de li ser van pirsan nesekine û nefikire. Lê di mezinbûna xwe de bivê-nevê ew ê li ser bifikire û li bersivêن van pirsan bigere. Ji bo me Kurdan ev yeka girîngtir û pêwistir e. Lewra dema ku



Dr. Celîlê Celîl vê havînê hat Swêdê û bû mavanê Kurdên li Swêdê. Wî di derheqê Kurdên li Dervayê welêt de weha digot:

-Kurd ji Kurdistanê dûr krtine, lê nêzîkê kurdbûyina xwe bûna.

em mezin dibin, em dibînin ku welatê me, jiyana me, zimanê me bindest e û em bi bindestî mezin bûne. Ji ber vê yekê ye ku hîn di piçûktiya xwe de merivêن siyasetçî û şoresger ji nava mîletê me derdikevin.

Ji bo min ev yeka lêhatinek bû ku ez bi pirsa kurdî ve, bi edebiyat, çand û hunera kurdî ve mijûl bibim. Bi daxwaza bavê min pirsa kultura kurd di mala me de cî girtiye. Dema me çavê xwe vekiriye, me dîtiye ku bavê me bi kultur û jiyana kurd ve mijûl dibe. Vê yekê ne tenê li ser min, herweha tesîra xwe li ser xuş û birayê min jî kiriye ku em mijûlî kultura kurd bibin û xizmeta mîletê xwe bikin. Em mijûl bûn, hîn jî dibin û weke xizmet ci ji destê me hatiye, me kiriye.

Ez çûme mekteba ermenî, lewra mektebênu kurdî tunebûn. Li mektebênu gundan dersêن bi zimanê kurdî hene, derbas dibe. Lê kimya, fizik bi ermenî ye. Lê li bajêr li mektebênu Erîvanê dersênu kurdî tunebûn. Ji bo kesen li bajêr, zimanê kurdî tenê li malê hatiye hînkin. Bavê min dixwend, dînîvîsî, me ji ber digirt, dixwend û em wusa fêrî kurdî bûne.

Sala 1954'an ez qebûl bûme unîversîte, fakulta tarîxê li Erîvanê. Û pênc salan pişî xwendinê ez çûme Lenîngiradê, sala 1959 min xelas kiriye. Li Lenîngradê, beşa Kurdzaniyê hebû. Orbeliyê Akademîker vekiribû û bi xwe jî serokatiya vê besê dikir. Kareki hêja dikirin. Qanatê Kurdo, Sugerdmân, Rûdenko û gelek edebiyatvanê

“ ...Loma daxwaza min ew e ku hemû kurdên siyasi xebatê xwe bi zimanê kurdî bikin. Bila, kêmqewet be. Rast e, gelek çetin e ku meriv dîtina xwe ya siyasî, aborî bi kurdî bibêje û bide fahmkirin. Lê em dikarin bi gotinênen xwe yên sade û sivik dest pê bikin. Bi tirkî, erebî, farisi û ürisî nivîsandin çiqas xweş û baş dibe bila bibe, bi van zimanen nivîsandin me ji hev dûrdixîne û zimanê kurdî jî kêm dibe, kurdayetî wenda dibe... ,”

kurd jî hebûn ku bi ziman û edebiyata Kurd ve mijûl dibûn. Li ber destê van zanayên kurdnasiyê, di vê mekteba zanyariyê de min gavêن xwe yên pêşin havêtin û di nava sê salan de min teza xwe ya doktoriyê nivîsî. Di 1963'an de min navê kandîtatiya ilmê tarîxê girt.

Berbang: Teza te ya doktoriyê li ser çi bû?

Dr. Celilê Celil: Teza min li ser şerîrina kurdan bo azadiyê di navbera salên 1850-1880'an de, bû. Piştî navê doktora xwe ez dîsa vege riym Erivanê. Li akademiya ilmî, li enstîtuya zanyariyê di beşa kurdzaniyê de min dest bi xebata xwe kir. Ji sala 1964 heta nuha li wê enstîtuyê kar dikim. Li akademiya ilmiya Ermenistanê de, Enstîtuya Rojhîlatzaniyê, beşa kurdnasiyê.

Heta nuha li dor bîst pirtükên min çap bûne. Piraniya wan li ser folklorê ne. Wek em bibêjin min û Ordîxan Zargotinên Kurda, Çirokêن Cimaatê, Zargotina Kurdên Sûriyê, li ser tarîxê jî sê pirtûk, min nivîsîne. Ji bo zarokên dibistanê min bibliografiya çap kiriye.

Berbang: Di malbata we de rewşa xwendekariyê çawa ye?

Dr. Celilê Celil: Di mala me de Ordîxan dest pê kir. Em çar zarok in. Du xwişk û du bira ne. Ordîxan di edebiyatê de dereca filolojiyê daye.

Dûre ez û xwişka min Cemîle ku çar sala ji min piçuktir bû, wê jî xwe li muzika kurdî girt û konservatuar xelas kir.

Xwişka min Zînê jî Enstîtuta edebiyata dunyayê bi navê Maksîm Gorkî, beşa wergerê xelas kir.

Bi daxwaza bavê min û bi dîtina me, hemû kesen malbatê jî xwend.

Berbang: Ji bo hilbijartina beşa tarîxê çi bû sedem ku hûn vî beşî bixwînîn.

Dr. Celilê Celil: Ya rastî xwestina

min ne tarîx bû. Fakulta rojhîlatnasî hebû. Lê dema min xwest ez li vê fakultê werime qebûlkirin, fakultê student nedigirtin. Wê salê 1954 xwendevanen fakultê bi téra xwe hebûn. Ji mecbûrî min tarîx hilbijart. Dibe ku min dîsa xwe li Fakulta Rojhîlatnasî binivisiya lê dîsa min xwe li tarîxê bigirta.

Tarîx ji bo me hemûyan gelekî girîng e. Lewra ku meriv di nava tarîxê de miletê xwe bibîne, wê çaxê meriv ê qedrê xwe jî û qedrê miletên dora xwe jî bizanibe, ya duduyan em tarîxa miletê xwe gelekî kêm dizanin û pir kêm jî hatiye nivîsandin.

Berbang: Di derheqê tarîxa me de, em jî dizanin û dibînin ku gelek kêm tiş hatine nivîsin û berhemên ku hene jî bi piranî bi destê kesen biyanî hatine nivîsin. Dokumenten ku hene, nişanê me didin ku di dîrokê de yekbûna milletê me hiç pêk nehatiye. Aya, li gor lêkolînen te, faktorên vê yekê ci ne?

Dr. Celilê Celil: Fektor gelek in. Di vî warî de faktor hene rolên mezîn lîstîne, faktor hene, ji bo faktorên rolmezîn bûne alîkar.

Wekî ku dixuye hemû faktor jî ji bona me bûne dijimin û ji bo dijiminêne me jî bûne alîkar.

Dema welatên rojava û rojhîlat kamîl dibûn, rengên dewletan didane xwe, û li ser erdê Kurdistanê bi her awayî ser dikirin, em kurd di çiyan de em jiyanekî konservatîv dijîyan. Ev jiyanâ me ya konservatîv û etnîkî rê nedaye yekîtiya me. Rast e, eşîrên me her yekî bi serê xwe şerekî mîrane dane, lê haya wî ji eşreke cîran ne bûye. Dema ku dijimin havetiye ser navçeyekî, eşîrên navçeyekî din pê neşewitiye û piştgiriya eşîra cîran ne kiriye. Anglo bîrûbaweriyeke nasyonal li ba eşîr û navçeyen kurd çênebûye. Fakotrên ku

ne hîstîne em bi hev re yek bin, jê yek jî dîn (ol) e.

Ku em jî wek welatên mayî, me bîrûbaweriya nasyonaliyê li ba xwe çêbikira û dûre dînê îslamêbihata, dibe ku iro rewşa me bi awayaki din bûya. Lewra îslam nabêje tu tirk i, ereb i, faris i an jî kurd i. Lê ew iro dibêjin em pêşiyê tirk in an ereb in û dûre dibêjin em îslamî ne. Lê dema ku me ya dilê xwe gotiye, me gotiye pêşiyê islam û dûre kurd. Û dîn jî ne hîstîye ku em jî xwe re bîrûbaweriyeke netewî çêkin.

Psîkolojiya eşîrî jî nehîstîye ku em yek bin. Dijimin jî nehîstîye. Eşîr li hemberî hev sor kirine û ew berdane hev. Ew bi hev dane kuştin.

Berbang: Wekî meriv di jiyanê de dibîne, pirseke yekbûynî heye. Herkes jî vê yekbûnê dixwaze, lê nabe, çênabe. Ev yekbûn ê çawa di nav me kurdan de çêbe?

Dr. Celilê Celil: Li gor min, yekbûyîn tenê bi daxwaza meriv çenabê. Ev girêdayê kamîlbûna entellektueliya wan şexsan e. Entellektuelî û xwendina meriv têrî hînek tiştan nake. Şexs divê bi xwe kamil bibe, bigêhîje. Bigêhîje ku daxwazî û pêwistîyê milletî, ji yên wî berztir û girîngit e.

Berbang: Di pirsa yekîtiyeke de rola kulturê çiye?

Dr. Celilê Celil: Kultur... Kultura guhdarîkirinê, kultura ku bikaribe daxwaza xwe bi yê hemberî xwe bide famhkirinê... Kultura maqûliyê hebe. Wê çaxê em zû hevdû bêhurmét nakin, ji bo cudayıya hînek bîrûbaweriyeke xwe, em ê ji hev nerihet nebin. Bîr û baweriya xwe jî bo nerihetkirina hevalê xwe bi kar neyne, bike ku ew li hemberî te bikaribe bifikire. Di vî warî de kultur roleke xwe ya girîng heye.

Berbang: Dema meriv şertîn milet-

büyinê bidin ber çavan, ji bo kurd ev sertên ha hene an ne?

Dr. Celilê Celîl: Sertên miletbûyinê, sertên ku Stalîn ji Lenînizmê derxist û got qalibê milletbûyinê eve? Miletbûyin bi qaliban nine. Di demên nêzîk de gelek milet hatin çekirin, wek dewlet sînor jî hatin danîn. Lî ku em werin ser milletê kurd, li gor qalibênu kû têngotin, milletê kurd dikeve wan qaliban jî. Erd, ziman, kultur, tenê danûstendinê aborî sist bûye, lê ew jî di navbera kurdan de her hebûye û berdewam kiriye. Li gel sînorêne dewletên dijmin jî miletê kurd ev danûstendinê xwe, çûyin û hatina xwe, kirin û firotina xwe jî hev nebirûne.

Em dikarin bibêjin ku em miletetê kevn, miletetê kamil in, gelek kamil in. Miletetê ewqas sal bindest, li ser erdê xwe û bi ziman û kultura xwe dijî.

Berbang: Ev nêzîkê sedsalî ye, em ji bo serbestiya xwe ser dikin. Ma ji hêla miletbûyinê de ev ne kêmasiyek e ku hîn jî yekbûyineke xurt çênebûye?

Dr. Celilê Celîl: Ku kêmâsi nebüya, heta nuha em ji zû de gêhiştibûn mera-mên xwe. Kêmâsi gelek hene. Ji xwe kêmasiya me ya mezin jî ew e. Lî ez dibêjim ew kêmâsi ne sedem e ku em ne milet bin.

Berbang: Di vî warî de giringîya ziman ci roli dilize?

Dr. Celilê Celîl: Ziman gelekî giring e. Heta ku tu bîvî giring e? Şerekî siyasi bifikire? Ji bo ci ye? Ji bo Kurdistanekê ye? Pişti şerê xwe yê siyasi tu ê welatê xwe çawa ji halê berê bidî cudakirin. Bi kultur û zimanê xwe meriv ji halê berê cuda dibe. Binêre, dema dijmin dixwaze kurdayetiye wenda bike, pêşiyê dike ku ziman û kultura xwe bi te bide hîn-kirin. Ew ne li hemberî xwendina te ne. Çiqasî dixwînî bixwîne. Lî ne bi zimanê xwe.

Li gundan dibîstanan çêdike. Lewra kurdêne nexwende hîn kurd in û kurd dimînin. Lî yekî ku di dibîstanen wan de bixwîne, bi ziman û kultura xwe ni-zanibe, ka ci kurditiya wî dimîne?

Pîra min kurd bû û hew! Kurdekkî kurdî nizane, ji kultura xwe dûrketiye, psikolojiya xelkê kurd nizane... bifikire ku Mem û Zîna me tuneye, di şev û sehiyêne me de sitran û govendêne kurdî nabin, di civatan de henek û zargotinê

folklorik tuneye... tiştên ku me bi jiyana kurdî ve girêdide ev tişt in.

Loma daxwaza min ew e ku hemû kurdêne siyasi xebatên xwe bi zimanê kurdî bikin. Bila, kêmqewet be. Rast e, gelek çetin e ku meriv dîtina xwe ya siyasi, aborî bi kurdî bibêje û bide fahmkirin. Lî em dikarin bi gotinêne xwe yên sade û sivik dest pê bikin.

Bi tirkî, erebî, farîsi û ürisî nivîsandin çiqas xweş û baş dibe bila bibe, bi van zimanen nivîsandin me ji hev dûrdixîne û zimanê kurdî ji kêm dibe, kurdayetî wenda dibe.

“...Yekbûyin tenê bi daxwaza meriv çenabe. Ev girêdayê kamilbûna entellektueliya wan şexsan e. Entellektuelî û xwendina meriv têri hinek tiştan nake. Şexs divê bi xwe kamil bibe, bigêhîje. Bigêhîje ku daxwazî û pêwistiyen milletî, ji yên wî berztir û giringtir e... ,”

Berbang: Di nav kurdêne Sovyetê de, xwendin û nivîsandina bi kurdî di ci merhelê de ye?

Dr. Celilê Celîl: Zimanê me li gunda gelek xurt e. Ji bo xwendin û nivîsandin di dibîstanan de heta koma 8'an zimanê kurdî derbas dibe. Wekî din, nivîskar, helbestvan û wergêrên me hene kitêban çap dikin. Wek rojname, Riya Teze dertê. Anglo xwendevan jî hene û tê xwendinê jî.

Li Ermenistanê koma kurdzaniyê heye ku tarîx û edebiyata kurdî bi rewşike ilmî dizane. Lêkolînîn ilmî dikin û weke pirtûk çap dikin. Ev tiştên ha bûrûbaweriya kurdayetiye li ba me kêm nakin, lê xurt dikin.

Berbang: Beriya ku tu werî Swêdê, li gor kovar, rojname û weşanên ku li vir derdiketin û digihîstin destê we, rewşa kurdêne li vir ci bi we dida zanînê û pişti ku tu hatî te çawa dît?

Dr. Celilê Celîl: Li wir li sovyetê min dizanibû ku kesen me yên siyasi ji neçariyê, mecbûr mane û berên xwe dane

welatêne xerîb. Swêd jî yek ji wan welatêne xerîb e. Weşanên ku digihîste destê min, ez pê gelekî kêfxwes dibûm, geleki! Kurd ji Kurdistanê dûrketine lê nêzîkê kurdbûyina xwe bûne. Rewşa weşangeriyê dide xuyakirin ku zimanê kurdî ê li ser lingên xwe bisekine, ciyê xwe bistîne. Ev bawerî bi min re çedibû û ne tenê bi min re, herweha bi gelek kesen din re jî.

Ez dibînim gelek xebatên weşang-eriyê weke profesyonelî dibin. Bi riya krîteren berhemên hêja, tiştina derdi-kevin. Lî tenê tiştê ku min dipa û nedît, ev e: Dibînim, ci li Swêdê, ci li Kurdistanê jiyanekê civakî bi hev re çenebûye. Min ev dît. Individualizm gelekî li pêş e. Bi awakî baş karêne indîviduel têne kîrinê. Kovar, rojname, pirtûk tene çapkirinê. Karêne hêja ne. Lî ku evên ha bicivin ser hev, xebat û xurtiya xwe yek bikin, ew ê pêşdetir û çêtir bibe.

Berbang: Di vê rewşê de nivîskar, lêkolîner û xebatkarên kultura kurd ji welatê xwe dûr in. Di nava ruhê welatî de najîn. Berhemên ku bête afirandin, aya ew ê çiqasî bi realîta welêt bikeve?

Dr. Celilê Celîl: Pirs ziman e. Ku meriv bi zimanê xwe bizanibe, ne astengeke mezin e ku ji welatê xwe dûrketibin. Şert û imkanê ku li ser krîteriya berhemên hêja dikarin xwe baş bigêhînin, zanebûna xwe bi pêş bixin. Ku meriv zimanê xwe bizanibe, dikare ji folklora kurdî jî iştîfade bike.

Berbang: Pişti ewqas kovar û pirtûkên bi kurdî derketin, di vî warî de noxteyek muhim hatiye rojeva munqaşê: Hin heval dibêjin berhem bila bi kurdî be ci dibe bila bibe, hin heval jî hene dibêjin zimanê kurdî ji wê merhele derbas bûye û êdî divê berhemên hêja bêne nivîsandin û çapkirinê. Li ser vê noxtê dîtina te ci ye?

Dr. Celilê Celîl: Ez tênağıhîjim. Meriv çîma bi awakî dogmatik bibêje bila di halê berê de be. Na. Bi vî awayî pêşdeçün çenabe. Nivîsandin, xwendin û dem her bi pêş de diçe. Em ê çîma bibêjin kî ci dide bila bide. Ku başen me li holê hebin, çîma dest bavêjin yên xirab. Madem başen me hene, bila yên xirab jî lê binêre, bixwîne û xwe jî bigîhîne. Ku bi qasî yên baş xwe nagîhînin, wê çaxê yêb xirab ji me re ne lazim in. Bila neyên nivîsandin. Na, ez fahm na-

kim! Lê tiştekî din jî heye, ku çêtir tunebe, bila yên xirab bêne nivîsandinê. Yênu ku bibêje baş tune û bila xirab jî neyête nivîsandinê, ev nabe, ne rast e. Mesele ev e.

Berbang: Bi ya te nivîsandina bi kurdi di çi merheli de ye?

Dr. Celilê Celil: Tişteku ez ji van salên dawîn fahm dikim, tendensek çêbûye ku bi kurdî gelek tiş têne nivîsandin. Li salên buhurî, zimanê kurdî pir xurt bûye. Naha êdî pirtûkên wek romanen têne nivîsandin û têne wergerandin. Ev tiştekî gelekî girîng e. Ev ji dide xuyakirin ku kurdî wek zimanekî edebî cî dide xwe. Wek ku ez dizanîm hevalen kurd dest pê kirine berhemên klasikên rûsi û nivîskarêne tirkan werdigerînin, hin ji wan wek pirtûk çap bûne. Merhela nivîsandina bi kurdî li ciyekî baş û ber bi pêşketine ye.

Berbang: Peyv hate ser wergerê, loma ez ji dixwazim bipirsim: Klasikên edebiyata ürisan di edebiyata dunyayê de li rêza pêşin cî digire. Aya heta nuha nimûnen klasikên ürisan ji hêla kurdên me yên li Sovyetê, hatine wergerandin?

Dr. Celilê Celil: Ez ji we re bibêjim. Pêşiyê divê em di warê rol û giringîya tercumê de serê xwe zelal bikin. Ji bo edebiyateke ku em bibêjin hîn teze guldide û dixwaze li ser lingan bisekine, gelekî ferz e ku klasikên bi nav û deng tercumeyi wî zimanî bibe. Çima? Çimkî klasikên dunyayê dide zanîn ku ew bilindirîn edebiyat e. Dema yên ku ji wan klasikan werdigerînin zimanê xwe, herweha dixwazin bidine xuyakirin ku zimanê wan ji, wan edebiyatê bilindirîn dihewîne. Rast e, wergerandin çetin e. Lewra nivîskarê berhemên klasik nivîsarêne li gor zimanê tercumeçiyekî nenivîsiye. Wî bi zimanê xwe nivîsandiye. Lê wergêr ci dike, difikire, xwe dêşîne ku cumla nivîskarê klasik çawa bi zimanê xwe bi cî bike. Ji hêla bikaranîna zimên de divê tercumeçî jîr be.

Berbang: Dema meriv berhemekî werdigerîne ser zimanê xwe, gelo meriv dikare bibêje ku ev berhema bû berhema edebiyata xelkê min ji?

Dr. Celilê Celil: Helbet. Wergêr du tiştan dike. Pêşiyê tu zimanê xwe bi pêş de dibî. Ya duduwa tu kultura xwe di gêhînî kultura milletê din. Kultura wan

nêzîkî kultura milletê xwe dike. Di navbera milletê din û xelkê xwe de pirekê ava dikî. Di zimanekî de werger çiqas pir bin, dewlemendiya wî zimanî jî ewqas biliind e. Nuha tiştekî ecêb e ku gelek klasikên dînyayê hene ku hîn nehatine tercumekirinê. Şekspîr bi kurdî tune ye. Kubarbûna her mîletî ye ku Şekspîr bi zimanê wî hebe.

Li Sovyetê li ba me gelek ceribandin hene. Ji rûsi, ji ermenî, ji gurcî tiştina hatine wergerandin. Lê tu bibêji li ba me wergerandin bi xurtî pêş de diçe? Na. Lê bila bereketa desten wan kesan be ku Pûşkin, Tolstoy, Çêxov, Yaşar Kemal, Azîz Nesîn wergerandine zimanê kurdî. Bi rastî jî dema ku min Pûşkin, Çêxov bi kurdî dît, min got şikir ji Xwedê re ev klasikên bi nav û deng bi kurdî jî derketin. Ji bo ku min zimanê van klasikên ürisi dizanîbû û rewşa min jî dest dida ku ez bidime ber hev, min rabû da ber zimanê orijinal. Bi qasî ku wergêran ji ber zimanê duduyan wergerandibûn, werger ji orijinalê xwe dûrneketibû. Xuya dikir ku bi zimanê duduyan (tirkî-swêdî) jî bi awakî bilind hatibû wergerandin. Li ser van herdu klasikên ku bi kurdî çap bûbûn, min di Riya Teze de du maqale nivîsand, min bimbarekiye xwe dan nîşandanê û min dixwest ku ev karê wergerê di nava kurdan de ciyê xwe bigire û ne tenê

klasikên ürisan herweha yên ewrûpî û welatên cînar jî bêne wergerandinê. Gelek nivîskarêne ku iro dijîn, hene. Ku meriv berhemên wan wergeranda kurdî, ew ê ji bo kultura kurdan bîbûya propogandistên dilovan.

Berbang: Mamoste, tu li ser Berbangê ci difikir?

Dr. Celilê Celil: Em kêfxwes dîbin dema ku dikeve destê me, em dixwînin, em pê şariza dîbin ku rewşa jiyana kurdîn Swêdê di ci merheli de ye, ci dîkin, ci dibe, heta derekê çawa dijîn.

Berbang: Ji bo çêtirkirina Berbangê pêşniyarêne te hene?

Dr. Celilê Celil: Belê. Rewşa kulturî û edebiyata kurdîn li Swêdê zêdetir bête diyarkirin, ew ê baştıri bibe. Ji bo pêşdebirina edebiyatê ku progameke armancî hûn bidine ber xwe û di rûpelên Berbangê de cî bidinê, ew ê çêtir bibe.

Ji hêla teknikî û çapê de kovareke baş e. Ez bawer dikim ku ji bo we çetin e, ku bi du tipan tê nivîsandin. Ez nizanîm hûn çawa dibîn, lê ku we dîsa bi hev re lê wek du kovarêne cuda cuda çap bikira! Ev yeka me ji hev dûrnaxîne, lê ji hêla çap û teknikî de rihet e.

Ez pîrozî û bimbarekiye li hemû xebatkarêne Berbangê dikim û sipas.

Berbang: Em ji gelek sipas dîkin.

Kasetta 2.

ya
DELAL
derket

Li komel û pirtûkxanêne
Kurdan bipirsin!

Anons



Quncika Tenduristî

SERÊS

Dr. Celadet Seîd

Li gundek pîrek û çend lawên xwe dijîyan. Şikir hêdî hemû lawên pîrê mezin bûbûn, zewêcî bûn û bûbûn xwedî kom û kulfet. Pişti malxweyê malê çû rehmetê, pîra jinebî li ser zarokên xwe rûnişt wan xwedî kir û mîr nekir. Ge têr ge birçî, nano-ziko çendik çendsal idara malê dibû, heta van bûkên bêbab yek bi yek hatin mala wê û hêdî gezek nan lê zêde diditîn. Di destpêkê da lawên pîrê guhêن xwe nadidan jinêن xwe, lê belê hêdî-hêdî jin ketin bin wan û wan xirandin. Bûkan lawîn pîrê li himber wê sor dikirin. Hêdî her roj bihevçûn û xirecir di malê da kêm nedibû. Tişte ku ji destê jpîra belengaz dihat ew bû ku wê her roj biçûya di quncikek xanî da rûnişta û hêdî hêdî ji halê xwe ra bigirîya.

Werhasil ezê ci serê xwendevan biêşînim, bi wî awayî sal-zeman derbas bû û bi pîra meya delal ra serêşekî gelek giran peyda bû. Ne bi roj ne bi şev hedana pîrê ji ber serêşê tune bû. Ne ziyaretên tîrb û qubêن seyîdan û ne ji nivişten mele û şêxan serêşa pîrê kêm dikirin. Rojek gundi li hev civîyan û ji lawê pîrê yê mezin re gotin: "Malneke-to hûn ji xwedê natîrsin, hûn çîma li dîya xwe napîrsin! Xwedê derd daye derman ji daye. Ka wê bibin bajêr ba hekîmek û dibe ku xwedê lê bê rehmê û dermanen wî lê bênen." Li ser van gotin û gazindên gundîyan lawên pîrê rabûn û pîrê birin bajêr, ba hekîmekî. Dereng berî êvarê tev ji bajêr vegerîyan. Gun-

dîyek çû pêşîya wan û ji pîrê pirsîn: "Pîrê tu çûyî ba hekîm, gelo hekîm ji te ra got ci û ci derman da te?". Pîrê li gundî zivirî û got "Lolo lawo ci hekîm ci hal. Tew ji xwe guh neda min. Min got serê min diêse, ew rabû derzîkî li qorika min xist."

Heqê pîrê hebû ku gazinda bike. Cârek, ji xwe ewê û hekîm ji zimanênev fahm nekiribûn. Ji xeynî vê, dîtin û hêvîyên pîrê û hekîm li ser serêşê û dermankirina serêşê ne wek hev bûn. Em çîroka pîrê li vir bihêlin û werin li ser pirsa xwe, pirsa serêşê.

Laşê meriv li hember tahlûkekî yan ji li hember nerehetîkî bi hinik nîşanan bala meriv diksîne. Eş bi xwe ji yek ji van nîşanan e. Wek nimune, gava ku destê meriv, bêhemdî, bi soba germ va dibe, ji bo meriv xwe biparêze pêra-pêra laşê meriv bi eşek (şewatek) tûj bala meriv diksîne.

Serêşa ji curekî êşê ye. Hemû nerehetîyên ku tu karibî bîmî bîra xwe, ango ji nexweşîyan bigre heta pirsîn siyasî, aborî, civakî, ahlaqî û hwd, dikarin bi meriv ra serêşê çêkin. Lî belê sedemên serêşê ci dîbin bila bibin, eş dîsa ji tê di serê meriv da rûdinê. Ji serêşê carna meriv dibê qey "wê serê meriv biteqe" yan ji "mêjî yê meriv wê belav bibe."

Wek di her warî da, di warê serêşê da ji zanebûn tîrs û xofa meriv kêm dike û meriv baştır dikare rîyek ji bo serêşê xwe bibîne.

Gelo çend cure serêş hene?

Ku meriv guh nede serêşen hûrik-mûrik, sê cure serêşen bijare hene. Serêşa "tabîî", migren û serêşa stresê. Gelek muhîm e ku meriv pê zanibe ka dirûbê serêşa meriv û kîjan ji vana bi hev dikeve.

SERÊŞA "TEBÎİ"

Sedemên vê serêşê hinek rewş û nexweşin. Bi kurtî hinik ji wan ev in:

Serêşa ji çavan: Xebata ku pir nêzî çavan be û bi balkışandineki deqîqî be, kare bi meriv ra serêşa çêke. Wek nimune, bi jinek ku ji sibê heta êvarê li ser xalîce û nexşan dixebite re, bê şik wê serêş çêbibe. Gava ku dijronahîya çavîn meriv da kemasî hebe yan ji di dereca berçavka meriv da xeletîyek hebe, dibe ku bibin sedemên serêşê. Bi hinik merivên navçe re yan ji bi pîr û kalan ra carna tezyîqa çavekî wan pir

zêde dibe û dibe sedemê serêşek dijwar. Ji xeynî ev serêşa bi nişkava li paş çavekî, nexweş bi wî çavî baş nabîne û li dora lemba û ronahî yên din xelekîn bi rengîn dibîne. Nexweşê bi van nerehetîyan divê here ba hekîmek.

Serêşa ji enfeksiyonan: Hemû nexweşîyen bi taya bilind karin bi meriv ra serêş çêkin. Wek nimune, gava meriv bi zekemê dikeve, carna li kêleka tayê bi meriv ra serêş û eşâ rehêna dora stuyê meriv ji çêdibe. Serêşa bi dillihevketin, vereşandin, bêtaqetî, xewmaşî û meyla ber bi xayîz bûnê ve, dibe ku rewşek xeter be û divê meriv bi lez nexweş bibe nexweşxanê.

Serêşa pişti derb li serî xwari: Bi derba li serî carna mêtjîyê meriv çelq dibe. Di rewşek weha de, serêşî demek dûrûdirêj pişti derbxwarinê ji dibe ku bimeriv re bimîne. Sedemên vê serêşê, li got hinik lêkolinan bêtir ruhî (psîko-lojîkî) ne. Ango pişti mêtjî çelqbûnê di mêtjîyê meriv de zerar an ji xesarek daîmî namîne. Lî belê yê ku bi serêş pîr an ji kal be, divê here ba hekîmek û muayene bibe.

Çend sedemên dî yên serêşa "tebîî": Li ciyê kar zêde teqe-req yan ji hink av û bêhnên kîmyayî yên ji bo sihetê nebaş, dikarin serêşê çêkin. Rojek pişti araq vexwarînê carna serê meriv diêş. Westandin, tansiyona (tezyîqa xwînê) pir bilind, mihandina movikên hestîyên stuyê meriv ji ji sedemên serêşê ne.

Çend tedbirên li hember vê serêşê: Ya herî baştır ew e ku meriv li sedemên serêşê bigere û bibîne û paşê ji li himber wan tedbiran bistîne. Wek nimune, gava ku ronahîya çavîn meriv kêm be, divê meriv jixwe ra berçavkek peyda bike. Derheqê çend rewşen xeter li jor min behskir ku divê meriv nexweş bibe ba hekîmek an ji nexweşxanê. Ji bilî van rewşan, meriv dikare hinik heban (wek Aspirin an ji Alvedon) li hember serêşê biceribîne. Ku van dermanan tu Feyde nekir, here ba hekîmek.

MIGREN

Migren serêşek taybetîye û gelek çetîn e, li belê bê tehlûke ye. Serêşa mîgrenê wek serêşek ku gumînî ji serê meriv bîne an ji ku wek di serê meriv da çîk bide ye. Hinik kesen bi mîgrenê, dibêjin ku serêşa mîgrenê wek ku

"bizmar di serê meriv da bê kutandin" ne. Ev ês pirî caran alîkî serê meriv digre û di enîya meriv de an jî li dor cênik û paşserê meriv de rûdînê. Ev serêş bi nobetan (krîzan) tê û di navbeyna 4-24 sactan dom dike. Mîgren sê caran ji mîran bêtir bi jinan re peyda dibe. Di eynî malbatê da dibe ku mîgren bi çend kesan re hebe û ji ber vê yekê jî hinik li ser munasebeta di navbera mîgren û îrsiyetê de jî disekekinin.

Du tîpêñ mîgrenê hene: Mîgrena normal û ya klasik. Di mîgrena klasik de, 20-30 deqîqe li pêş serêşê, li ber çavêñ meriv pirtikên bîriqandî çedibin an jî li cî û tiştêñ meriv lê dinêre hinik nuqte û alîyê wan xuya nakin. Li kêleka van nîşanan, kêm cara jî li pêş mîgrenê, nîvê laşê meriv piçek dixurê, çîk dide an jî nîv-ditevize û carna jî meriv gêj e, bêhizûr e, xwehdide û serê dilê meriv dixeñire. Di mîgrena normal de meriv berîya serêşê bi tiştek nahise. Anglo mîgrena normal nişkave, bêyî ku tu nîşanan bide, bi serê meriv digre. Bi serêşê re dillihevketin, vereşandin, hesasyeta li himber rohnî û dengêñ bilind, müsterekêñ herdu tîpêñ mîgrenê ne.

Sedemêñ mîgrenê ci ne?

Krîza mîgrenê, her çiqas di mîgrena normal de berîya nobetê xwe eşkere neke jî, lê belê berîya ku serêş xwe nîşan bide dest pê dike. Rehêñ xwînê, yên wî alîyê ku wê serê meriv bişê, xwe diguvêşin hev. Sedemêñ vê guvaştinê ku qasî rojek didome, iroj baş nayen zanîn. Gava ku wan rehêñ xwînê dîsa xwe sist dikin û fireh dibin, ew serêş mîgrenê ku min li jor salox da, dest pê dike. Destpîka krîza (nobeta) mîgrenê bi hinik faktorêñ din va jî girêdayî ye. Ka em bîstekî li van faktoran hûr bibin:

Faktorêñ ku karin serêşâ mîgrenê bidin destpêkirin:

- * Bêhizûrî, hêrs, tîrs û xof, bêxewwî an jî kêmxeŵî û hwd
- * Hinik xwarin û vexwarin, wek penîr, fêkî (hirmê), şeraba sor, çoqulat, şîr û hwd
- * Rewşa hewa yê; wek, ba û bager, serma, zêde germî û rutûbet.
- * Birçî mayîn, dereng xwarinê xwarin an jî li ser danek da qebazdan.
- * Duyê çixarê, bêhna parfûm û avêñ paş rîkirkirinê, spreye por.
- * Ronahî ya ji tava tûj, ji televîsyon

ü sînema yê, çavêñ baş nabînin.
* Bi cilketina pîrekan re, krîza mîgrenê dibe ku dest pê bike.

Meriv çewa dikare pêş li krîza mîgrenê bigre û wê derman bike?

Bê şik, berf her tişti divê van faktorêñ jorîn her tim di bîra meriv da bin û meriv xwe ji wan dûr bike. Wek nimûne, divê meriv li ser xwarin, vexwarin û razana xwe sersarî neke. Anglo, divê meriv di wextê da bixwe, vexwe û razê. Nimûneyek din, gava li derva ba û bager hebe, derva sar be, meriv dikare kumek bide serê xwe. İdman (jîmnastîk) taqeta meriv li hember nobeta mîgrenê qewîmtir dike û dibe ku jîmarêñ nobetan kîmtir jî bike.

Hinik dermanêñ ku bê hewcedarî ya reçeteyek meriv dikare bikire, wek Aspirîn û Alvedon, tu dikarî li himber serêşâ xwe bi kar bînî, bi kîmasî demek biceribînî. (Ku ser dilê te tirş dibe, tu diperçîfî an jî kevçika dilê te diêse, Aspirîn'ê bi kar neyne!)

Gava tu di şikê da bî, gelo serêşâ te mîgrene an tiştek din e, wê demê divê tu herî bahekîmek.

Dermanêñ mîgrenê du cure ne: Yêñ ji bo pêşî li nobeta mîgrenê girtinê û yêñ ji bo nobetê bi xwe ne. Ger bi te re mehê ji sê caran bêtir nobeta mîgrenê çê dibe, wê gavê divê tu her roj derman bixwî.

SERÊŞA STRESÊ

Piranî ya serêşan dikevin vê grubê. Wek tezyiq û guvaştinek li pişt çavan, li ser enî, argûşk (çene), stû û polêñ milan, ev serêş xwe nîşan dide. Li gel vê serêş, bi dest şidandinê, carna meriv di koka porê xwe de an jî çemastû yê xwe de bi hesasyetek dihise.

Ev serêş bi nobetan nayê, kare demek dûrûdirêj dom bike, carna kêm bibe, carna zêde bibe û meriv dibê qeyek serê meriv di êyanek (tasek) de dijdîne û diguvêşê.

Sedemêñ vê serêşê di jiyan a meriv bi xwe da ne. Ji kêm ronahî ya malê, ciyê kar, ji çîr-çîr kirin û baş li ser hev rûneniştina herdû qorjêñ diranan bigre heta hemû pirsên civakî, siyasî, aborî, ehlaqî û kulturî (bi van va girêdayî; xizanî, betalî, tîrsa zulm û tadeyî yê...hwd) dikarin bibin sedemêñ vê serêşê.

Pirî caran, meriv bi xwe nahise ku ji

van sedemêñ jor, meriv di bin barek giran de ye, zorê dide xwe û gelek rehêñ dora stû û polêñ meriv her tim di bin van baranda şidandî û guvaşî ne.

Çend tedbîrêñ li hember serêşâ stresê:

Cu dermanêñ ku serêşâ stresê ji binî karîbin wenda bikin tune ne. Divê meriv, heta ji dest bê, xwe hînî dermanê êşbirînê neke. Dibe ku van dermanan (heb û fitîl) serêşâ te piçek kêm bikin, lê belê ji ber ku sedemêñ serêşâ te hê jî ji piya ne, pişti tesîra heban wenda bibe tu yê dîsa derdê serêşâ bikşîni.

Li ser jiyan xwe ya rojê bifikire û li sedemêñ dibe ku bi te re serêşê çêkin, bigere. Bê şik, ku ji destê te bê, ji bo serêşâ xwe kêm bikî yan jî di bin kontrola xwe de bîhêlî, jiyan xwe bi serûber bike, hinik guhertinan tê de çêke.

Gava ku te nihêrt wayê êşa serê te wê dest pê bike, meşek rojê qasî deh deqîqe (lê her roj bi muntezem, ne ku heftî carekî û bi saetan), ajotina bisqilêtê (duçerxê), qasek bazdan an jî bîstek çavêñ xwe germkirin dibe ku serêşâ te siviktir bikin.

Bala xwe bide ka kijan rehêñ te guvaşî ne yan jî bi şidandinê hesas in. Bi idmanek (jîmnastîk) sivik tu dikarî wan rehan nerm û sist bikî. Ev rî, rî ya herî baş e ku serêşâ meriv kêm dike. Ger bi van tedbîrêñ li jor tu ji heqê serêşâ streşê deneketî:

BILA DI BÎRA TE DE BE

Serêşâ stresê û ya mîgrenê du serêşen muzmîn in, anglo bê tedbîr û dermankirin karin demek dûrûdirij heta bi salan bidomin. Lê belê merivek bi serêşâ muzmîn, di şertîn jêrîn de divê here xwe rami hekîmek bide:

* Ku serêşâ wî/wê çiqas diçê xerabtir dibe.

* Ku bi serêşâ, ku ne ji mîgrenê be, re vereşandin jê çêbibe.

* Ku bi kuxukê, kenê, bêhnijandinê yan jî ku bi xwe şidandinê re nişkava serêş bi meriv re peyda bibe.

* Ku bi serêş re guhertinêñ şexsîyetî û ruhî jî çêbîbin.

* Ü ku bi serêş re tevizandin an jî bêruhmayîna alîkî laşê meriv peydâ bûbe.

rojên bêñ bi berhem û xezîneyên netewayetî yên Kurd tîjî bike, bi berhemên nivîskarêñ xwedî armanc, pêşengêñ xwedî xizmeta ziman, edeb, folklor û dîroka gelê Kurd re dostan peyda bike.

Ji "Kurdistanê" Heta "Hawarê"

Eger em di demek kurt de jî be li wê qonaxa ku dikeve navbera derketina rojnama Kurdistanê (1898) û kovara Hawarê (1932) binêrin, ji me re ronî dibe ku di navbera 36 salan de, hejmarek gelek zêde kovar û rojnamên kurdî li Kurdistanê li derveyî Kurdistanê derketine, lê hejmarek gelek kêm ji van temendirêj bûne, hinek ji van ji çend hejmarañ derbas nebûne lê rojnamen temendirêjîn me jî hebûne.

Berî derketina kovara Hawarê du kovarêñ din jî li Kurdistanâ Başûr derdiketin, Zarî Kirmancî (1926 - Rewandiz) û Ronakî (1930-1935- Hewlêr), lê di perçen din ên Kurdistanê de qet rojname û kovarek aşkere nederdiketin. Piştî hatina Mîr Celadet Bedirxan li Kurdistanâ Rojava (25.8.1930) du sal şûn de, yekem hejmara kovara Hawarê (15.5.1932) li Şamê derxist. Hawar, ji hejmara 1'an heta 23'an bi tîpêñ erebî û latînî çap bûye, lê ji hejmara 24'an heta 57'an tenê bi tîpêñ latînî hatîye çapkiran. Ev yeka han jî hêjayî gotinê ye bi hewl û xebata Kak Hemereş Reşo, di sala 1976'an de ew hejmaren bi latînî derketibûn hemû pêk ve li Berlîna Rojava cara duyem hatine çapkiran. Kak Hemereş, di pêşgotina çapê de xwendewaran agahdar dike ku hemû hejmaren wê li ber destê wî ne, lê ji ber ku ji hejmara 1'an heta 23'an bi tîpêñ latînî û erebî ne, her wiha tipa "k" li gel tipa "q" cî guhertîye, wek nimûne: gotina "Kurd" bi vî awayî nivîsandîye : "Qurd" an gotina "bike" kirîye "biqe", ji ber vî wan 23 hejmaren çapnekirîye. Mixabin Kak Hemereş bê heq xwendewaren Kurd ji van 23 hejmaren Hawarê pêpar kirîye, lê li gel vî jî karê Kak Hemereş Reşo ciyê rêzê ye û xizmetek mezin e.

Pêşgotina çapa Berlînê ji alîyê -

Lêkolîn

KOVARA HAWARÊ

Cemşîd Heyderî

Bê guman dema mirov behsa rojnamegerîya kurdî bike, bixwaze yan nexwaze divê mirov behsa malbata Bedirxanîyan jî bike. Ji ber ku wan di vî warî de serokqafletî û pêşengî kirine. Vêca madem ev mesele wiha ye û bi serê xwe nivîsandina Hawarê ku ji alîyê kesekî jêhaû, zanayekî mezin û welatparêz û dilsozekî wek Celadet Bedirxan ve dihat meşandin, wezîfe hîn girantir e. Ca ji bo danexuyakirina rola Hawarê di dîroka kultur û rojname gerîya kurdî de, eger bi çend gotinan jî be, wezîfa behsa binemala Bedir xanîyan dike ser milêñ me. Kovara Hawarê û xwedîyê wê, mîratgir û berdewamkarê rîbaza yekem a rojnama kurdî ye. Ev yek hêjayî gotinê ye, di vî kurtegotarê de, ku ji bo wan 23 hejmaren Hawarê hatîye amadekirin, ciyê wê nîne ku behsa dîroka Bedir xanîyan û rola wan di xebata asê ya gelê Kurd ji bo rizgarî û pêşxistina kultura netewayetî de bikin. Ji ber ku her ferdek ji wê binemalê pêwistî bi çend lêkolînên kûr û berfireh heye ku tîrêj bixe ser xizmeta Bedirxanîyan ên tîravkirina deravê ziman, edeb û dîroka Kurd, her wiha parastin û rizgar-kirina keleporêñ netewayetî yên Kurd ji fewtandinê, li gel xebata wan a siyasi ya ji bo rizgarîya Kurdistanê.

Rewşenbirêñ Kurd ku navê van şexsiyetîn han: Mîqdad Midhed, Ebdul-rehman, Ebdulrezaq, Celadet, Kamuran û Sureyya .. û hw. dibîne, yekser ta-

bloya xizmeta wan kirine bi awayê hîva çardeh rojî ronahî xistîye ser dîroka kultura Kurdan, dibîne. Ger tu lêkolîn û nivîsandin li ser wê binemalê neyê kirin, tenê lista navê wan, pirtûk, rojname, kovar û gotarêñ wan nivîsandine û weşandine bête berhevki-rin, di hecma pirtûkek mezin de ciyê wan nabe.

Ev hêjayî gotinê ye, ku Kak Mehmed Bekir wezîfa amadekirin û transkrîpkirina wan 23 hejmarañ ji tîpêñ erebî li ser tîpêñ latînî û amadekirina wan di du cildan de daye ber xwe, cilda yekem li gel pêşgotinek 27 rûpel ve di sala 1987'an de çap kir û gîhand destê xwendewarêñ Kurd. Bê guman bi vî yekê Kak Mehmed Bekir karekî gelek hêja bi cî anî û jîyanek nû da Hawarê. Ew 23 hejmaren ku Kak Mehmed pêşkêşî xwendewarêñ Kurd kirîye, em hêvîdarin cilda wê ya duyem jî amade bike. Ev hejmaren han di muddetê 50 salan de ji alîyê Mamosteyê têkoşer û dilsozê Kurd Osman Sebrî ve ji şewitandin û wendabûnê hatibûn pa rastin... Mamoste Osman Sebrî wan hejmarañ ji tirsa dagîrker û rejimên kevneperek, di kunêñ dîwaran, di bin erdê de veşart. Her çendîn xwe ji destê dijmin neparastîye û ketîye destê wan û zîndanan dîşîye û êşkence lê hatîye kirin, lê Hawar bi awakî wisa veşartîye ku dijmin tu carî bi ser nekeve! Ji bo ku rojek bê nivşê nû yê Kurd ji dîroka kultura xwe bêpar nebe, meşîyê nivşê

Xwedê jê razî be- Dr. Nureddîn Zaza ve hatîye nivîsandin. Lê gelek mixabin ci amadekerê çapê û ci jî Dr. Zaza di pêşgotinên xwe de, ne li ser jîyana Celadet û ne jî behsa cîyê Hawarê di rojnamegerîya kurdî de nekirine. Li vir cîyê wê ye ku em dîqeîê li ser lêkolîna Huseyn Hebeş a li ser Hawarê kirfye bikişînin. Ev lêkolîna han li Zanîngeha Moskovayê ye, heta niha bi kurdî nehatîye çapkiran, tenê kurtîya wê lêkolînê di sala 1982'an de bi Rusî ji alîyê Zanîngeha Moskovayê ve hatîye belavkirin.


Armanca serekî ya vê gotarê ronîkirina du xalêن girîng ên wan 23 hejmarêni bi tîpêن erebî û laşînî hatine çapkiran e:

1) Girîngîya derketina Hawarê bi du tîp û du lehçan.

2) Beşdarbûna nivîskarêne Kurd ên di perçen Kurdistanê yên din di Hawarê de nîne.

Yekem

Di dîroka rojnamegerîya Kurd de, Hawar yekem kovar e, ku bi du tîpan hatîye çapkiran, yanî bi tîpêن latînî û yên erebî. Bi vî awayî jî Hawar yekem kovar e, ku bingeha tîpêن latînî di zimanê kurdî de bi kar anîye û nivîsandîye. Lê fikra bikaranîna tîpêن latînî di zimanê kurdî de digihîje destpêka vê sedsala ha ku li ser rûpelîn kovara "Rojî Kurd" ku problemê elîfûbaya nû hatîye munaqêsekirin. Lê ev xewna han di sala 1932'an de, di kovara Hawarê de cîyê xwe digre. Li gor bawerîya zimannasên Kurd, tîpên latînî lêhatîtir e li gel qanûnên gotinsazîyen zimanê kurdî, ji deriveyî vê gavek e ji bo nêzikkirina zaravê kurdî û zimanê yekgîrî ya edebîyata kurdî. Dîyar e, Hawar di vî warî de rêxweşker bûye ku heta niha jî li Kurdistanâ Bakûr û roj ava li ser riya wê têt meşandin. Lê ji bo ku Hawar bi tîpên erebî jî hatîye çapkiran, ji bo xwendewar û nivîskarêne Kurd ên li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê re derî heta pişt hiştiye vekir. Dîyar e derketina Hawarê di despêkî de bi du tîp û du zaravan, di dema xwe de, hengaveke mezin bûye. Ji bo



Xwedî û berpisiyarê kovara Hawarê, Mîr Celadet Bedirxan

nêzîkkirina awayê dîyalektêne zimanê kurdî û peydakirina nasîyê di navbera nivîskarêne herdu zaravêne serekî yên zimanê kurdî de.

Di hejmara yekem de, her çend bi du cur tîp derketîye, armanca xwe ya li ser belavkirina elîfûbaya nû ya kurdî (latînî) daye xuyakiran. Nivîskarêne Hawarê ji hejmara yekem ve hewl dane, xwendewaran re awa û bingehê bikaranîna tîpên latînî û prensîbêne dabeşkirina tîpên dengdar û bêdeng ... h. w. d. bidin naskiran. Di hejmara yekem de, di derbarê elîfûbaya nû ya kurdî de, gotarek bi sê zimanane belav kirîye -Kirmancîya jorê, tirkî û erebî-, her wiha armanca kovarê jî bi du zimanane belav kirîye (kirmancî û erebî). Dîyar e armanca bi erebî belavkirinê ew bûye ku dîqeta xwendewaranê Kurdistanâ Başûr bikişîne ser kovarê.

Wek me di destpêkî de behs kir, Hawar, hejmara yekem di 15.5.1932'an de derketîye. Di hejmara 3'an de ku 15.6.1932'an de derketîye, yekem nama pîrozbahîyê bi kurmanciya başûr belav kirîye, ev ku ji alîyê mamoste Hamid Ferec ve hatîye şandin û wiha dibêje : "... demek bû me çaverîya sitêrka Gelavêj a me Kurdan dikir. Heta do me bi çavêne xwe dît; ew jî kovara Hawar e ku çavê hemû Kurdeki ronî kirîye, hêviya me ew e ku bi ronîya tîrêjên xwe yên geş ve hemû Kurdistanê ronî bike...". Di hejmara 4'an de Hevindê Sofî ku naznavê nivîskarekî Kurdistanâ Başûr e, dibe yek ji wan nivîskarê Hawarê heta hejmara 23'an (yanî heta Hawar bi tîpên erebî têt çapkiran) bi berdewamî gotar belav dike. Ev yeka han hêjayî gotinê ye, ku ji hejmara 4'an şûn de

nivîsandinên kurdanciya başûr hêdî hêdî li ser rûpelên Hawarê ciyêن xwe digrin. Xwedîyê Hawarê û nivîskareñ wê hewl didin ku ew nivîsandinêن ji Kurdistana Başûr dikevin destê wan, bi tûpêن erebî û latînî çap bikin. Bê guman ev karê han rolek mezin ji bo hevnaşina nivîskareñ herdu zaravan û nivîsandinêن wan de lîstîye. Cara yekem çavêن xwendewarêن kurdanciya jorî bi berhemê nivîsandinêن kurdanciya xwarê geş dibe û yên kurdanciya xwarê jî herweha ji yên kurdanciya jorî. Ji ber ku hinek ji nivîskareñ Kurdistana Başûr cara yekem li ser rûpelên kovara Hawarê têن saha nivîsandin û weşanen. Li Kurdistana Başûr gelek bi germî pêşwazî li Hawarê kirine. Di hejmara 5'an de pîrozbahîya mamosteyê dîroknîvîs Huznî Mukriyanî hatîye belavkirin. Sergotara beşê tûpêن erebî ya hejmara 6'ê Hawarê ji qelema Mamoste Şakir Fettah e. Her wiha beşê latînî jî bi gotara Hevindê Sorî destpê dike. Şakir Fettah wiha dinivîse : "Hawar - dukeleke reş a ah û nalîna ji serpêhatîyen Kurd e...". Yan jî nivîskarek din di hejmara 7'an de wiha dinivîse : "Dengê Hawarê ji Şamê di pişt wan deşt û çolêن bîyanî ve têt guhêن min û çiyayêن me re derbas dibin, lê di dilê min de tesîra wê naguhere, ne tenê di dilê min de belko di dilê hemû Kurdekkî de. Hêviya gula çîlmisi geş dike. Mey-

la azadîyê teze dike, me ji perîşanî û perçê perçetîya me dide hesandin".

Di hejmara 8'an de nivîskarek ji Akrê bi naznavê Mamoste wiha dinivîse :

Hawar hate çiyayan
Deşt û gund pê lerzan
Bangî azadî Kurdish
Yekbûnî xweşî dilan
Kewte naw mal û xêzan.

Bê guman name û pîrozbahîyen van nivîskaran hîsa piranîya rewşenbîren Kurdistana Başûr a beramberê kovara Hawarê didin xuyakirin, bi taybetî yekem kovara kurdî bû li Surîyê dihat belav kirin û nivîskareñ Kurdêñ başûr jî di pê dengê wê de hâtine. Ev jî hêjayî gotinê ye, ku di wê demê de kovar û rojnamêñ kurdî tenê li Kurdistana xwarê derdiketin û ew jî bi elîfûbaya erebî dihatin çapkirin. Dema Hawar bi tûpêñ erebî û latînî derketîye holê, vê yeka han jî hêviyek nû ji xwendewaran re bexşandîye û ji bo qahîmkirina elîfûbaya latînî di zimanê kurdî de destpêk bûye.

Her wek me di destpêkî de behs kir, derketina Hawarê bi du elîfûbayê, ci ji bo hînkirina xwendewaran bi elîfûbayê be ci jî peydakirina nêzîkahîyê di navbera xwendewarêñ herdu awayêñ berhem û nivîsandinêñ yek û du de, xizmetek bûye. Lê mixabin ber-pirsîyarêñ Hawarê ev karê han dirêj nedomandin, ji hejmara 24'an sün de Hawar tenê bi tûpêñ latînî derdikeve. Mixabinîya me ji ber wê nîne ku Hawar bi latînî derdiket, ji ber wê ye ku li Kurdistana Başûr ev firseta han ji bo nivîskareñ Kurd bi cî nehatîye. Bi-karanîna elîfûbaya latînî, yan jî rewşa siyâsi ya dewleta Iraqê di vî warî de li pêşîya nivîskaran astengek bû. Vêca pişte vê Hawar tenê bi latînî derdikeve. Nivîskareñ Kurdistana Başûr ji kovarê dûr dikevin. Dîyar e ji ber wê nebûye ku nexwestine latînî pêşde biçe, belko nikaribûne latînî bixwînin. Eger Hawar bi herdu tîpan bihata berdewam kirin, xwendewarê Kurdêñ Başûr jê bê par nedibûn. Bê guman derketina Hawarê bi yek elîfûbayek, ji hejmara

24'an sün de, dibe asteng û pingar di pêşîya gîhandina netîcê yek ji wan wezîfêñ kovarê ku di destpêkî de dabû xuyakirin. Yanî nêzîkkirina herdu zara-vayêñ zimanê kurdî û hengavek ber bi zimanê yekgirtî ya edebî ve.

Ciyê ecêbmâyînê ye, çawan zana yekî wek Celadet gavek wiha avêtiye û elîfûbaya erebî rakîriye. Di wê demê de hîna ew rewş û zemîn ji bo xwendewarê Kurdêñ başûr û rojhilat peyda nebûbû, ne tenê rê nedabûn tûpêñ lafîni belko her qedexe ji bû. Di vir de pirsek têt holê, gelo ji ber ci Celadet ev bîryarê daye? Ji bo ci lez û bez kiriye? Ev yeka han hêjayî gotinê ye Dr. Nureddîn Zaza ku yek ji wan nivîskareñ Hawarê bûye, di wê pêşgotina ji bo wan hejmarêñ Hemeres Reşo di sala 1976'an de çapkirî nivîsandîye, li ser vê tiştekî nabêje.


Duyem

Beşdarbûna nivîskareñ Kurdistana Başûr di kovara Hawarê de, wek di pêşî de behs kir, hinek nivîskareñ Kurdêñ başûr cara yekem li ser rûpelên kovara Hawarê xwe bi xwendewarêñ Kurd dane naskirin.

Kovara Hawarê ji hejmara 4'an heta 22'an, 26 babetê nivîskareñ Kurdistana Başûr belav kiriye, yan jî bi gotinek din nîvîn rûpelên xwe ji bo kirmanciya xwarê amade kiriye.

Di van hejmaran de, hejmara nivîskareñ Kurdêñ başûr ji yên bakûr zêdetir e. Ji ber ku nivîskareñ başûr di rîya postê de beşdarî nivîsandina kovarê kire, berhernek wan a zêde neketîne destê xwedîyê kovarê. Hinek ji nivîskareñ başûr naznav bi kar anîne ku gelek mixabin heta niha jî navê rastî yên wan şexsîyetan ji me re ronî nebûye... :

Hevindê Sorî, Pîrot, Mamosta, Lawêkî Kurd, Xidok, Serjêr (li gor qeneeta min ev gotina han bi şâşî hatîye nivîsandin, mimkun e rastîya wê Serdbîr be, ku seroknîvîsarîyê dike, se-roknîvîsar ji Celadet Bedirxan bûye, li gor bawerîya min wî jî kirmanciya xwarê wisa bi başî nezanîye, ji ber vê dibe nivîskarek ji Kurdistana Başûr be



Bergê pêşîn ya Hawarê, bi tûpêñ Erebi

ku ev nasnava han bi kar anîye). Lê Hêmin, S, Lawêkî Kurd Perwer, Pirot, Xidok mirov dikare her çend ji sedî sed nebe jî, di riya awayê nivîsînê van nivîskaran ve navê van nivîskaran bibîne. Wek nimûne mirov dikare bêje Xidok, Huseyn Huznî Mukriyanî (1897-1947) ye, çunkî nivîskarê navê wî derbasbû, çend nivîsînê din di kovara Dengî Gêftî Taze de bi vî navî belav kirîye, her wek Mamoste Kîwî Mukriyanî jî* di nivîsandinek xwe de dîqeta vê yeka han kêşaya. Yan jî xwendîyê gotara "Mişurî Dwa Roj" ku bi navê Lawêkî Kurd hatîye nivîsandin, ji Silêmaniye ji Hawarê re hatîye şandin, ji nivîsandina qelema Ebdulwahid Nurî (1903-1944), yan jî ji yê Reşîd Necîb (1906-1968) derkebine. Li gor bîranînê Mamoste Nurî Şaweys, ew nivîsandinê ku di salên sîyan de bi navê "Hêmin" hatine nivîsandin, Mamoste Ezîz Şalî ye**, yan jî ew nivîsandinê bi navê "Mamosta" ji Akrê gotar ji Hawarê re şandîye, divê Mamoste Marif Ciyawuk (1885-1958) be. Ji ber ku yê navê wî derbas bû di sala 1932'an yanî wê demê qaymeqamê Akrê bûye, her wek di kîtêba Mamoste Elî Seydo Goranî "Min 'Iman Alî El-'Imadiyye" de derbas dibe, ji ber ku Elî Seydo di wir de behsa Marif Ciyawuk dike ku gelek alîkarî daye wan deman -1932'an-. Dîsa jî ez nikarim bêjim ev yeka han sedî sed e. Ew nivîskarêna rasterast bi navêna xwe gotar di Hawarê de belav kirine ev şexsîyetêna han in :

Ebdulla Goran (1904-1962), Tewfiq Wehbî (1897-1984), Ebdulxaliq Esîrî (1897-1962), Tahir Fuad (?), Ewnî Koyî, Fayiq Bêkes (1905-1948), Pîremêrd (1876-1950) ... Ji derveyî van, Hawar di hejmara 4'an de şî'rek Hacî Qadirî Koyî di bin navê "Ey Kurdîne Woşyar Bin" belav kirîye, bi vê yekê jî deriyê belavkirinê ji bo zara-vayê kurmancîya Xwarê vekirîye. Ew yeka hêjayî gotinê ye, destâ nivîskarêna Hawarê, yan jî baştir e bêjin Celadet Bedirxan, hewil daye piranîya berhemîn kirmancîya xwarê ne tenê bi elîfûbaya erebî belkî bi elîfûbaya laşnî jî belav bike, bi vî karê han jî xizme-

tek mezin ji bo nêzîkkirina herdu şeweyen zimanê kurdî kirîye. Her wiha bi giştî ji xwendewarêna Kurd re zimanê edebîyata kurdî daye nasandin.

Curê wan babetêna di besê kurmancîya xwarê yên di Hawarê de hatine belav kirin:

Şî'ir, nesir, name û silavname, di warê ziman û edebiyatê de lêkolîn, di warê civakî û perwerde de(ew ê ciyê ecêbmâyînê ye ev yeka han e ku çiroka kurdî li Kurdistan Başûr di wê demê de serî hildabû, lê yek çiroka kurdîya başûr di Hawarê de nehatîye belav kirin).

Şî'ir û Nesir

Di hejmara 4'an heta 22'yê Hawarê de 17 perçê şî'ir û 2 perçê nesir hatine belav kirin, ji van :


3 helbestêna Ebdulla Goran û li gel 2 perçê nesir.

4 helbestêna Ebdulxaliq Esîrî.

Nimûnê nivîsarêna bi nesir ên Goran :

Çav...

Çav: du per in ji kitêbeke muqeddes, tejî ye ji ayîna husn!.. Heqîqeta ruh e, sira dil, razakanî derunî, bi herfa nur tê de nivîsandîye.... pişt re dête ser wesifkirina curêna çavan û wiha dînivise : Wek sev res in, hinek jî çesnê pîroz hişin in, hinek çavê din jî hene tu dibêjî çavêna bazê ne, wek yaqt agir



Ji hejmara 24 ta 57 an ya Hawarê di sala 1976an de careke din, pêk ve hatin çapkirin

ji wan dîbarin.... (Hawar, hejmar: 12). Yan jî li ser rundikan (firmisk, êstir) Goran dibêje: Dilopek av.. lê ji avê ronîtir, ji agir ronaktir, ji nester tuj-tir.. (Hawar, hejmar: 13).

Di Hawarê de Name :

Di Hawarê de sê cur name hatine belavkirin :

1) Namên pîrozbâhiyê.

2) Namên serxweşîyê.

3) Namên bi şî'ir hatine aristekirin...

Namên şî'ir di edebiyata kurdî de diçin digihin wan herdu camekeyî Nâlî û Salim, lê di kovar û rojnamên kurdî de, cara yekem Mamoste Cigerxwîn di hejmara 10'ê Hawarê de, name şî'rek arastê Ebdulxaliq Esîrî dike, di hejmara 14'yê Hawarê de jî Esîrî bersîva Cigerxwîn dide. Ew yeka hêjayî gotinê ye, peywendîya gîyabî ya di navbera Esîrî û Cigerxwîn diçe digihija sala 1932'an, lê ev peywendîya han dirêj dikêse û piştî 26 sal li ser belavbûna vê şî'irnamê de, yanî di sala 1958'an de, piştî serkevtina şoreşa 14'yê Tîrmehê li Iraçê ku Cigerxwîn bi naçarî ji Surîyê diçe Iraçê û di Enstitütya Ziman a Bexdayê de kar dike, vêca ew û Esîrî hevdû dibînin.. Cara dawîyê jî ew herdu şair hevûdu li Kerkukê dibînin. Ev hevdîtin jî vegera Mamoste Cigerxwîn ji kongra mamostêna Kurd a Şeqlawa ya sala 1959'an ber bi Bexdayê ve, li ser riya xwe li Kerkukê serîki li Esîrî dide.

Di Hawar de Lêkolînêna Di Warê Edebîyat û Zimanê Kurdî de

Li gor bawerîya min yek ji wan lêhatîtirîn nivîskarêna Hawarê ya besê kurmancîya xwarê, Hevindê Sorî ye ku rolek wî ya girîng di nivîsandina kovarî de hebû, bi taybetî di warê edebîyat û ziman de. Her çend heta niha jî navê wî nivîskarê me ji me re ronî nebûye, lê ez di wê bawerîye de me ku Mamoste Refîq Hilmî be. Çunki Refîq

Hilmî piştî durustbûna Partîya "Xoybûn" û berî wê jî li Tirkîyê nasbûna wî li gel Celadet Bedirxan hebûye.

Edebiyat

Hevindê Sorî di hejmarê 5, 7, 8 ê Hawarê de zencîrek gotar di bin navê "Edebîyatû Kurdî" de belav kirîye. Rexne û gîli li rewşenbîrêndi Kurd dike ku pitir girîngî dane zimanê bîyanî û ji bo edebîyata xwe fînekoşîne. Her wiha nivîskar, hemû cure nivîsek edebîyat nahesibîne, ji ber ku edebîyatê bi vî awayî tarîf dike : "ji gotin û bêjîngkirina tiştek pêk tê ku bi 'jiyan'ê ve girêdayîye û ku pêwistî 'jiyan'ê ye". (Hawar, hejmar : 5, 1932, rûpel : 2). Herwiha Hevindê Sorî dema ku tê ser new'ên edebîyatê dîqatê dikişîne ser stran, çîrok û edebîyata komedî, bi taybetî jî dîqatê li ser dramê dikişîne. Dema ku tê li ser edebîyata kurdi, dibêje ku edebîyata kurdi ji wek edebîyata cihanê bi stran û şî'ir serê xwe hildaye... , Hevindê Sorî li ser nebûna edebîyata dram an komedîyê di nav Kurdish de bi vî awayî datîne: "Vêca çînku edebîyata komedî bi qewmê bilind a mutedî ve girêdayî ye û gîlek pêwistî medenîyet e." (Hawar, hejmar : 7). Bê guman nivîskar heta derecek rast çûye ser meselê, ji ber ku peydabûna janerê nû di edebîyat de bi gişî peywendî bi dereca pêşkevtina civak û fikra civakî ve heye. Her gavek di pêşkevtina civakê de pêwistî naveroker kek nû ye, ew jî dibe sebebê ji dayîkbûna formêñ nû ..., her çend ev prensîpa han li gel dayîkbûna janerê dram û komedî di edebîyata Yunanî û Romanîyan de li hev nagre, lê ji bo edebîyata gelek netewan karektereke gişî ye.. Ji van jî, bi awakî sade biçîma edebîyata dram a di folklor a gelek netewan de berçav dikeve. Di beşê sêyem a gotara Hevindê Sorî de, li gor bawerîya min, cara yekem edebîyata muqayeseyî ya Kurd ji dayîk dibe, çunkî nivîskar hewl dide Mem û Zîna Xanî li gel destana Yunanî İlyada muqayese bike.. Bê guman muqayesekirina nivîskar ji bo van herdu destanan

peywendîya wê bi forma (pwême, melheme, destan) ve heye. Nivîskar her wiha dîqetê dikişîne ser destanê bi şî'ir ên folklorî, wek nimûne ji van: şî'ira "Leşkrî" yan beyta Leşkrî ya li ser Mîrê Herîfî û "Xanzade Xatûn", di gotara xwe de, naveroka destana "Leşkrî" pêşkêşî xwendewarê Hawarê dike. Hevindê Sorî di hejmara 16'ê Hawarê de di warê yekgirtina ziman de anketekî ji xwendewarê Hawarê re amade dike û tê de van pirsên li jêr dike :

- 1) *Zimanê kurdi çawan saf û pak têt kirin?*
- 2) *Sêwe û Lehçen Kurdistanê çawan nêzîki yekûdu têt kirin?*
- 3) *Zimanê kurdi çawan pêş dikeve?*

Bê guman ew sê pirsên Hevindê Sorî 57 sal berî niha ji xwendewarê kurdi kirîye, niha jî bersiva wan a temam nehaşîye dan û cîyê li ser axistînê ye di nav civak, dezge, komel û rewşenbîrêndi Kurd de. Di hejmara 21'an a Hawarê de, nivîsandinek bi naznavê "Lawêkî Kurd" ku di hejmarek din a Hawarê de her bi vî navî nivîsandinek belav kirîye, di bersîva wan pirsên jor de dinivîse û çend ji bo damezrandina komelek bijar çend pêşnîyar pêşkêş dike û wiha dibêje : "Hemû çiqeq vê komelê pêwistî e li gundan bigerin û gotinêñ xas û xwaşik ên kurdi peyda bikin... li jor û xwarê Kurdistanê û kovarek taybetî bê belavkirin" û her wiha dinivîse : "Damezrênerên vê komelê piştî li ser sekinînek gelek zêde ji bo nivîsandina ferhengek kongreyekê çêkin û herçi kelimek xweşik a jor û xwarê heye helbijêrin û ferhengekê amade bikin". Pişt re nivîskarê navê wî derbasbûyi pêşnîyar dike ku li ser bingeha helbijartina gotinêñ pirr me'na û li ser "usula îmlayê Tewfiq Wehbî Beg û Bedirxanîyan bê durustkirin", lê di warê nivîsandina latînî ve wiha dinivîse: "Dema ku em serbest bibin, em dikarin latînî bi-nivîsin".

Di derbarê zi.nanê yekgirtî de Pîrot di Hawarê, hejmara 10'an de gotarek

belav kirîye û wiha dinivîse: "Li gor bawerîya min berî hemûtişî wezîfa xwendewarêndi Kurd, hewl û bizavdane ji bo yekxistina lehçen zimanê kurdi. Li gor qeneeta min kovara Hawarê di vî warî de dikare alîkariyeke baş bike". Ji derveyî vê Pîrot di derbarê ferheng û yekîtîya zimanê kurdi de gelek pêşnîyarêng kirine. Vê jî daye nîşan ku eger Hawar ji bo demek din li ser wê rîbazê berdewam be: "Ew dem lehçeyek müşterek a kurdi dadimezire û ji bo hevdû tîgîhiştinê, em mecbur na-bin feydê ji zimanekî ecnebî (xerîb) werbigirin".

Ew yeka hêjayî gotinê ye ku di hejmara 15'an a Hawarê de, nivîskarê bi naznavê "Lawêkî Kurdperwer" gotarek rexneyî li ser Mamoste Tewfiq Wehbî nivîsandîye. Dîyar e li gor qeneeta wî lawî Kurd wisa bûye ku Tewfiq Wehbî çûye Surîyê û dixwaze şêweyê Silêmanîyê li ser hemû Kurdish ferz bike, ji ber vê bi xeyîd wiha dinivîse: " Gelo dixwaze rasterast şêwa Silêmanîyê ya deh hezar kes li ser, bi ser şêwa şes mîlyon Kurmançî bixe". Lê di bersîva Hawarê de ji me re ronî dibe ku wê demê, tenê şevekê li Şamê dimîne û pişt re vedigere û qet peywendî bi wê ve nîne ku bi şêwa Silêmanîyê nivîs di kovarê de belav dikir.

Bê guman nivîsandinê li ser hemû babetêndi Hawarê de hatine belavkirin, pêwistî bi lêkolînek fireh heye ku giringîya wê kovarê di dîroka kultura gelê Kurd de diyar bike û rola xwedîyê wê Mîr Celadetê mezin û xizmeta wî ji Kurd û Kurdistanê re nîşan bide. Bê guman cara duyem çapkirina wan hejmaran ji alîyê Mamoste Mehmed Bekir ve, zîndîkirina Hawar û Celadet e. Kak Mehmed bi vî karî wezîsek mezin a niştimanî ya pîroz pêk anîye û xizmetekê hêja ji nivşeyen nû û dîroka kultura me re kirîye. Ez hêvîdar im, ku nimûnen rewşenbîrêndi me yêñ wiha zêde bibin.

(*) Li gel vê jî, ez di wê bawerîyê de nînim, ku ew şî'ira bi navê Xîdok di hejmara 10'ê Hawarê de ku hafîye belav kirin a Husen Huznî Mukriyanî be.

(**) Nurî Şaweyî, Bîreweryekanîm, rûpel: 106.

ZIMANÊ ÇÜKAN

Di hejmara dawî ya Berbangê de, nivîsarek bi navê "Dîtinê ku her tişt bi min dest pê dike û ez yekemîn im!" çap bû. Nivîskar A. Tigrîs pêşî li ser du têzén hawirdoran û perwerdevan bi kurtî disekine û dawî jî, wê bi rewşa kurdan ya îro ve girê dide.

Helbet di warê rojnamevanî de an jî wekî nivîskarên meqalên cûrbecûr mafê herkesî heye ku dîtin û fîkrêñ xwe bo xwendevanan bigihîne. Mirov dikare rexne û dîtinêñ xwe û bi awayekî ciddî yan jî bi tinazî binivîsîne. Tiştekî bingehîn e ku divê mirov dîqqet bike, gava îddiyayêñ "tûj" hebin, divê babeta bûyerê bi nav, zeman, naverok û bi awayekî rast were pêşkêşkirin ji bo xwendevanan. Da ku kes û dîtinêñ ku têñ behs kirin, rexne lê tê girtin yan jî têñ îthamkirin bizanibin ku nivîs behsa wan dike. Heta mirov rê bide wan ku bikaribin xwe biparêzin. Yê girîngtir, xwendevan ji zimanê nivîsarê agahdariyek esasî bigre. Divê em ji bîr nekin ku xwendevanêñ rojnamêñ kurdan ji hemû kategoriyan civatê têñ. Ji gundî, cotkar, ji ne xwende heta xwende û ronakbîr. Herkes ji nivîsaran bi eynî derecê fam jî nakin, her weha nikarin texmîn jî bikin. Ji xwe mana rojnamevanî ewe ku mirov bi nivîsarêñ xwe, yan bi nûçeyen taze yan jî bi dîtinêñ xwe perspektifêñ fireh bide xwendevanan.

Em vejerin ser nivîsê. Nivîskar dixwaze bi 9 xalan dîtinêñ xwe li ser perçekî rewşa kurdan diyar bike. Peyv û termêñ ku hatine bikaranîñ wekî li jêr nivîsandî ne;

"Kirinêñ ronakbîr û serokêñ kurdan"

"Serokêñ me xwenda ne", "Ew hebin her tişt hene, ew tune bin hîç tişt tune", "Li gor yekî", "Yekî din", "Hinek xortêñ xwendevan ên kurd di 15-20 saliya xwe de ji welêt derdikevin", "Rojnamevanê kurd ê yekemîn ez im", "Min cara yekem ...Alfabâ kurdî nivîsiye û çap kiriye", "Ji derê me sosyalistêñ kurd tunin" û h.w.d.....

Li gor nivîsarê lazim e failêñ van îddia û îthamêñ hin "kes" hebin bi navkirî, bûyer bi xwe, kingê wan gotinan kiriye û delîlêñ din jî hebin ku baweriya xwendevanan pê were. Wek nimûne,

eger ez rabim bêjim, "îddia" bikim "derveyê min herkes derewan dikin" yan jî bêjim "filankes (bi nav) li filan cî vekirî got ku; "derveyê min herkes derewan dikin", ji ber wî di "filan" cihê û "filan" wextê de li ber "wan" kesan vî gotinê kir. Helbet ferqek mezin di navbeyna wan herdu gotinan de heye.

Xalêñ ku A. Tigrîs nivîsiye û bi awakî tevayî işaret pê dike, îddiyayêñ biçûk û ne girîng nînin. Lazim e ku xwediyêñ wan em bibînin û bila herkes ji ji wan agahdar bibin.

Mesela, kî ne ku, îddiyayek vekirî kîrine û gotine yan jî nivîsandine:

- Her tişt bi wan destpêkiriye û ew nebin tiştek nîne,

- Hebûn û dîroka kurd bi me/min dest pêkiriye û bi min dê dom bike,

- Ji derê min sosyalistêñ kurd tunin,

- Min cara yekem romana, alfaba kurdî nivîsiye, filma kurdî çêkiriye.

- Ki ne ew xortêñ 15/20 salî ku dibêjin; "zanabûna zanyarî bi min dest pê kiriye. Ji derê min herkes nezan e. Ez ci bêjim û ci bikim kes nikare rexne li min bigre. Ji ber ku cara yekemîn min vê sazgeha ha saz kiriye".

Berî hertiştî di karûbarêñ siyasî, civakî yan jî ilmî de mirov nikare tinazê xwe bi emrêñ hin kesan bike. Gelek însan di emrekî ciwan de, di warêñ cûrbecûr de rolêñ mezin lîstine. Lê, herweha gelek kes bi emr be jî temîatake tuneye ku ew hertiş rast dibêjin yan jî bi her awayî karê baş dikin. Li vir ya girîng ew e ku ew kes, di kîjan emrê de be bila bibe, ji bo menfeata gelê kurd xebat kiriye yan na.

Wekî din, gelek vekirî ye ku sazgehîn demokratik ên li Ewrûpê ji alî hêz û mirovîn siyasî hatine damezrandin. Yek an çend kes bixwazin gotinêñ weha jî bikin tu kes rênade ku platformêñ weha de ew bi ser kevin. Nimûnen vê jî gelek in.

Xuya ye, nivîskar A. Tigrîs gelek vê pirsê lêkolaye û vekirî dizane ku failêñ van îddiyan kî ne. Gelo ji bo ci ji xwendevanêñ Berbangê vedişêre? Em dikarin bi nivisa xwe perspektif bidin xwendevanan, wan bidin fikirandin, lê ne ku em îthamêñ tûj bavêjin holê û

aktorêñ wan jî herkes li gora xwe peyda bike, kaosê ku ji xwe berê da heye, wê gêştir bikin.

Dîsa, ez dixwazim ji nivîskarê bipirsim, tu bi xwe ji vî gotinê çi têdigihîjî?

"Pişti van çend mînakan, mirov baş dibîne ku ji serokêñ polîtik heta ên demokratik û kesen ronakbîr ên kurd tev di yek dîtin û mantiqekê de ne; her tişt bi min dest pêkiriye û ez yekemîn im."

Ez bi xwe weha têdigihêm; hemû serokêñ polîtik, demokratik, hemû kesen ronakbîr ên kurd bê istisna dibêjin ku "her tişt bi me dest pê kiriye û em in yekeminê her tişti".

Ez bawer im, fêda me gişa heye ku, em xwe ji iitham û îddiyayêñ "tevayî" xilas bikin û bikaribin xwediyêñ fîkrêñ çewt destnîşan bikin, da ku ew carek din fîkir û ramanêñ xwe yên çewt nexin nav kurdan. Di aliyê din ve ez bawer nakim ku îroj fîkrêñ çewt yên weha eger hebin jî, zêde itibar û bawerî di nav kurdan da nagire û kes wan jî guhdarî nake. Kurd bi xwe wek netewe ji tişten weha tûj hez nakin û bêtirs li dij iddiyayêñ weha çewt bi xurtî derdikevin.

Aliyê metot ve; nivîskarê maqalê diyar e ji çend ronakbîren kurd hêrs bûye lê bi vî nivîsê hemûyan girtiye li hember xwe. Serî wî de yek-dudo babeten weha ku bi cih girtiye, xwestiye wan hîn firehtir û mezintir bike, bi awakî sansasyon pêşkêşî xwendevanan bike. Ji serokêñ hêzan, rêxistinê demokratik, ji nivîskar û rojnamevan heta hemû ronakbîren kurdan, tev xistiye yek kategoriyeke. Ew bi xwe tenê alîkî de, yên din hemû alîkî de û bi xwe jî hem siyasetvan, hem rojnemevan, hem nivîskar, zimanzan û hem jî ronakbîr. Wê gavê ji min re gelek xerîb tê ku kesekî xwediyê ew çend wasfîn baş çawa ji destê A. Tigrîs xilas bûye, bala wî qet nekşandiye. Li gor teorîya jor ku bi xwe pêşkêş dike, diviya bû ji bo xwe jî çend gotinan bigota.

A. Tigrîs bi "zimanê çûkan" dipeyive. Bi tenê ew bi xwe faîlêñ "îddia" yên xwe nas dike. Ji bo ku xwendevan bikaribe baweriya xwe bi gotinêñ wî bîne, divê xwe hînî "zimanê çûkan" bike.

Keya Izol

Guhêrandina berhemên zargotinî

DI ÇANDA NETEWİ DE KADASTROFEKE MEZIN Û GIRİNG E.

amed tigrîs

Berhemên zargotinî (folklorî) bingeh û çavkaniyêñ ziman û wêjeya (edebiyata) devkî û nivîskî ne. Bi taybetü zimanê kurdî ku li welêt qedexe ye û ji ber vê yekê jî heta niha bi awayekî azad û serbest nehatiye nivîsandin.

Berhemên zargotinî malê gel in. Ew hilberînên kolektîv in. Her yek bi xwe xwedî dîrok û bûyerékê taybetî ye. Xwedîjîyanekê dûr û dirêj e. Hinek ji wan malên cend sed an jî çend hezar salan in. Dibe ku temamiya berhemeye zargotinî, di carekê de jî ne hatibe aflatandin. Gel skeleta wê bi ser û guh dike. Çerm, goşt û jîy pê ve dike. Paşê bi kinc û bergên rengîn wê dixemlîne û morî û rişikan pê ve dike. Ew di pêvajoyekê dûr û dirêj de, li gor mercen jiyana civatê û bîrûbaweriya wê demê, karekter û formeke netewî digre. Xweza her yek li gor sosyo-ekonomiya dema xwe û li gor gelş, lec û sergêjî, şahî û dilşadiyêñ dema xwe pêk hatine û têñ. Ew her yek, bi xwe neynika dema civat xwe, deng hîs û daxwazên dema xwe ne. Her civat li gor dema xwe, bi stran, helbest, çirok, metelok, pêkenîn, gotinêñ pêşîyan û wd. jiyana xwe, daxwaz û pirsên civata xwe dide dîyar kirin. Bi kurtasî, ew her yek, rûpelek ji dîroka jiyana gel a rast û berbiçav bi xwe ye. Wek mînak, mirov dema li berhemên dema mîrîtiyê (feodalizmê) dinêre, hema hema piraniya bûyeran li gund derbas dîbin û mîrxasên bûyeran ji mîr, mela, şivan, Qeraş, ker hesp û hwd. in. Lî iro ciyêñ bûyeran ne bi tenê gund in, bajar in jî. Mîrxas jî hatine guhartin, di şûna mîr de patron û axa, di şûna mele de doktor, ebûqat, karmend, an karker hene. Naverok jî wekî

wê demê, bi tenê ne ol e, iro doza netewî heye. Aborî, civakî û kulturî hene. Di şûna kerê de jî otomobil an balafirê ciyê xwe girtiye. Ü iro eger mirov van berhemên zargotinî yên wê demê, bixwaze biguhêre, meleyê wê derbixe û doktor bike şûnê, an jî ker derbixe û balafirê bike şûnê ew dê çiqas ne rast û komik bibe, na? Bi guhartineke biçûk, mirov bi zanîn an bi nezanî dîroka demeke dûr û dirêj încar dike. Wê ji navê radike. Ev, kadastrofeke netewî bi xwe ye.

Girîngiya berhemên zargotinî yek jî, jê ev e, ku xezîna gotin, biwêj û bêjeyan dewlemend dike. Bi berhevkinâna berhemên zargotinî, zimanê kevin yê veşarî ji tarîtiyê derdikeve der. Ew gelêñ ku zimanê wan ne hatiye nivîsandin û ahaftin, zimanê wan li ser wendabûn û mirinê ne; bi lêkolîn û berhevkinâna berhemên zargotinî zimanê wan, ji mirin û wendabûnê rizgar bûye û dibe. Zimanê Tacik û Kirgizên Sovyetîdi vî warî de mînaka herî berbiçav e. Pişti Şoreşa Oktobirê di nav 20-30 salî de, bi alîkariya berhevkinâna zargotinî, zimanê wan bû zimanê dewletê.

Dema mirov berhemên zargotinî berhev dike an jî li ser kar dike, divê û pêwîst e, ku mirov bi du destan bi orjinalê bigre û baş wê biparêze. Divê mirov li ser orjinalê nelîze, li gor dil, daxwaz û bîrûbaweriya xwe orjinalê neguhêre. Bi awayekî temamî an jî hinek gotin, hevok û rêzan lê kêm û zêde neke. Dibe ku ji aliyê naverok, bîrûbawerî ve kêm û çewt be jî. Ji xwe ev tiştîkî xweza ye. Wek hemû civakêñ cîhanê, civaka Kurd jî, her roj ber bi guhartinê ve diçe. Ev bûyer û qanûnekê dîyalektîkî ye. Çawa mirov nikare gera roj û hîvê bide rawstandin, herweha mirov nikare pêşveçûna civakan jî bide rawestandin.

Ji ber ku dewletên dagîkerên Kurdistanê, ziman û wêjeya me qedexe kirine, heta niha berhemên me yên zargotinî nehatine berhevkin. Bi devkî di nav gel de mane. Di van deh salêñ dawî de, li derê welat wek di her warî de, di warê berhevkinâna berhemên zargotinî de jî, her çiqas kêm be jî çend

gav hatine avêtin û têñ. Helbet ew ji bo me serfirazî û kêfxweşiyek e. Lî belê bi vê serfirazî û kêfxweşiyê re kovan û dilêşînî jî hene. Ev jî di dema berhevkinin û pêşkeşkirina van berheman de, hinek kes orjinalan diguhîrin. Li gor dilê xwe, hinek tiştan li wan kêm û zêde dikin. Dema mirov li ser van guhêrinan ji wan dipirse, hinek guharbaz dibêjin "ew kevin bû, min wê nûjen (modern) kir." Hinek jî dibêjin, "na orjinala wê wek min nivîsandiye an jî gotiye. Li hêla me weha dibêjin." Ü hinek jî bê bersiv dimînin. Bi ya min sedem ci dibe bila bibe, ev kar û xebata orjinal guhartinê, di wêje û çanda kurdî de kadastrofeke gelek mezin û girîng e. Ew kul û birînê ku di wêje û çanda kurdî de vedike êdi bi salan ne qesam digire û ne jî xweş dibe. Dibe ku wek nexweşîya kanserê qet tedawiya wê jî tune be. Çima?

Ji ber ku orjinal tê guhartin û bi awayekî çewt dikeve nav dîroka wêje ya kurdî. Êdi ew, ji hezaran an ji mîlyonan re dibe mal. Orjinala berhemê berî ku bê nivîsandin û berhevkinâna dibe ku di heremekê gelek teng de bête zanîn, lê iro dema ku tê nivîsandin û amadekirin êdi bi awayekî guhartî, li seran serê Kurdistanê û cîhanê tê belav kirin. (1) Bi awayekî çewt ji herêma xwe ya teng derdikeve der. Di vî warî de gelek mînak hene; lê ez di xwazim mînakeke herî berbiçav ji strana ku Şivan Perwer bi navê "Hey Gidî Xeydokê" distre, bidim. Li gor Şivan orjîna stranê weha ye:

Hay gidî, hay gidî
 Hay, hay gidî Xeydokê
 Şîrînê şemamokê
 Li min gidî Zeynokê
 Bejna te zirav e,
 Wekê şitla tihokê
 Hay gidî, hay gidî
 Hay, hay gidî Xeydokê
 Şîrînê şemamokê
 Li min gidî Zeynokê

Li Rihayê dewran e, lo
 Li Swêrekê ferman e.
 Li Rihayê dewran e, lo
 Li Swêrekê ferman e.
 Ji bo xatirê Xeydokê,
 Eşîr di tev de di şer de ne.

Ji bona çavê Xeydokê
Eşîr di tev de di şer de ne.
(Neqerata Hay gidi hay gidi.)

Xeydok hat û awa çû
Kê lê nêri ji der ve çû
Xeydok hat û awa çû
Kê lê nêri ji der ve çû
Ji bona xatrê Xeydokê
Xwîna sêsed mîri çû lo,
Ji bona çavên Xeydokê
Eşîr tev ve têkveçûn.

(Neqerat)

Ci Xeydokek dil û can lo
Xort tev jê re bûn qurban
Ci Xeydokek dil û can lo
Eşîr tev jê re bûn qurban lo
Qet li bîra xwe nanîn
Lê ci bûye Kurdistan.
Hemû ketin doza wê
Lê nefikirîn ketin

(Şivan Perwer kaset-10)

Lê, qasî ku ez dizanim, orjînalâ vê strana han ne Xeydok û ne jî Zeynok e. Qasîda "Şêx Seîd Rabû" bi xwe ye. Bi kurdi jê vê curê strana olî re qesîde an jî beyt tê gotin. Min qasî 25-30 berî niha, bê hejmar vê strana netewî- olî ji devê haviz û şêxikan bihîstiye. Ew dema dihatin nav gund dest pê dikirin, li tepêkên xwe dixistin û distran. Heta çend sal berî niha li Dîyarbekrê hafizan li ber derê Mizgefta Mezin (Ulucamiyê) û li ser goristana Derê Mêrdînê, li teplikê xwe dixistin û pê re qesîda "Şêx Seîd Efendi Rabû" digotin. Ji wê qesîda han a ku çend rêtêne wê di bîra min de mane weha ne:

Ha rabû, ha rabû,
Fermana Kurdan rabû!
Simêlîn sor sosînî
Di xwînê de winda bû!
Ha rabû, ha rabû,
Şêx Seîd Efendi rabû!
Gola xwînê pir kûr e,
Debra nû nade qamê.
Gulleyên vê kafirî,
Dizûrin wekî guran.
Çavên vê kafirî, (2)
Diçirsin wekî çiran!

Ax lo li me hewarê,
Dem dêwrana dînyayê.
(.....)

Gelo ji van herduyan kîjan orjînal
e?

Em xelkê li aliyekî bihêlin, li aliyê din , gelo iro çend mirîd, mele an hafiz bi orjînalala strana "Şêx Seîd Rabû" dizanin. Lê bi "Xeydokê" ji Stockholmê heta Mahabat û Silêmaniye jî Kurd li ba wê govendê digrin û distrin. Lê bi awayekî çawa?! Wek min li jor got, hinek kes, li orjînalê gotin, hevok an jî rîz kêm û zêde dikin. Lê hinek jî wek di strana jorîn de dîyar û zelal e, ji binî ve diguhîrin. Ji derê awaz ti têkiliyê van herdu stranan hîc bi hevdu re tune. Ez dixwazim di vê babetê de xalekê gelek girîn bidim diyarkirin ku ev jî mijara varyant an e. Di gelek çirok, stran, helbest, metelok û hwd. de, li gor her heremê varyantên cuda cuda hene. Lê belê evê han ne varyant in. Lê, armanc û babeta vê nivîsara han ne varyantên cuda cuda ne. Guhîrînen orjînalane e.

Ez dikarin mînakekê din jî, li ser pirtûka Xwençe bidim. Xwençe bi xwe berhevokeke zargotinî ye. Ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve hatiye berhevkirin û nivîsandin. Di Xwençe de, mirov rasîf her cureyê zargotinî tê. Di gelek helbest, stran, çirok û hwd. yênu ku di Xwençe de hene, hatine guhartin. Lê ez dikarim ji nav Xwençeyê di warê guhartina orjînalê de mînakeke berbiçav bidim. Ew jî Kundiro ye:

KUNDIRO

(.....)

Kundirê avya ewil e
Kirin qamyona û trêla
Kirin qamyona û trêla
Hingî heşaro mezin bû
Tekrê wan diteqandin
Serî li şifera digerandin
Waweylê kundirê mîranî
(.....)

Kundiro weyla kundiroo
Kundiro weyla kundiro

Ji Demîrel purgurîtiro
Ji Ecevit malvirektiro
Ji Tirkeş fesadçitiro
Wawelê kundirê mîranî
Wawelê kundirê mîranî
(.....)

(Xwençe-1 rûpel 34, Zeynelabidîn Zinar, Stockholm 1989)

Herhes baş dizane ku ev berhem di nav Kurdan de, berhemeke gelek kevin e û ya hêla Mêrdînê ye. Belkî dîroka wê digihê hezar salan, ku wê çaxê ne Demirel, ne Ecevit û ne jî Erbakan hebû û ne jî bay û kalêwan. Dibe ku gelê me dema Kundiro biafrîne hîn bapîrîn Tîrkan ne hatibin Rojhilata Navin jî. Ew hîn li Asya navîn bin. Lê ev jî heye, ku di van salêni dawî de hinek kes vê çirok an strana han di warê sîyasî de bikarbînin û navê Demirel, Ecevit û Tîrkeş xistibin cîyên navêni kesen din. Lê belê, guhartin tenê bi van navêni sîyasetvanen dagîrker ne bi tixûb e; tevâyîya berhemê hatiye guhartin. Gelek baş e ku hîn xelkê herêmê bi orjînalê baş dizane. Bi rastî mirov nikare bêje "ma va ye gelê me dibêje û min jî ji devê wan girtiye. Ji devê kê?"

Di berhevkirina berhemên zargotinî de, divê ew kesen berhevkar an nivîsende bi baldarî bixebeitin. Yek an du kesan wek çavkanî têr nebînin û ji gelek aliyan ve lêbikolin. Navêni wan herêm û kesen çavkanî û mîjuya nivîsandin jî, ji bir nekin û binivîsin. Divê mirov wek gurê birçiyê ku bi lez û bez êris dibe ser pez, nebe ser berhemên zargotinî. Piçek bi aram be. Heger ji her yekî çend var yantên cuda cuda jî hebin, divê mirov wan hemûyan bide ba hevdu û ya herî rast jê hilbibjêre û pêşkêş bike. Heger ne stran û cureyên berhemên din bin, pêwîst e, ku mirov bi awayekî rast hemû varyant binivîse.

1.. Armanca min, di vê nivîsarê kêm û biçükdîtina berhemên van hevalan nîne; di bingehê xwe de giranbiha û hêjabûna kar û xebata wan e. Lê herweha ev babet gelek nazik e, baldarî û berpirsiyari jî dixwaze. Ev prensip ne tenê ji bo van herdu hevalan, ji bo herkesi derbas dibe. Divê û pêwîst e, ku mirov li ser gotûbêjan bike.

2. Qest çavên Mustafa Kemal ên şîn in.

KÜŞTINA MEHSÛM

LOKMAN POLAT

Sîpan xorkeki feqîr bû. Hê nû ze-wici bû û hinekî ktibû binê deynan. Sipan di zarotiya xwe da şivanî kiri bû, paşê hinekî mezin bû bû, bavê wî jê re kerek dîtibû bû, da ku biçe çiyê ji dehlê êzingan bîne. Paşê ji ji xwe re çû ber sefarekî û bû şagirt, pîfi nepaxê (pif-dankê) dikir û bi wan re diçû gundan firaxên gundiyan sîpi dikir. Ji ber ku hersal diçûn gundan, hendî rê û dirbê hemî gundan baş dizani bû û gundiyan tev jî ew nas dikir.

Sipan gava ji gundanbihata qezê sirf diçû ba merivê şoresger rudinişt û ji wan re qala gund û gundewariyê dikir, tiştê ku şoresgeran jê re bigotana di heşê xwe da dihiştin û gava disa vedi-geriya gund ew tiştan ji gundiyan re û ji xortan re qal dikir. Ji ber ku Sipan qala kurdîtî û soreşgeriyê ji wan re dikir, wan ji sîpan pir hez dikir û hetanî

nivê şevê bi hev ra şevbuherka xwe dikirin, xeber didan.

Di karê sefatîyê da pere pir ne di-man. Sîpan bi wî perê ku qezenc dikir tutê zivistanê dikirî lê têr nedikir. Ji ber vê yekê Sîpan ji xwe ra fikirî û got: "Divê ji xwe ra çarekê bibînim." Ji êvarê heyâ serê sibê her difikirî ku rê û çare-kê ji xwe re bibînê û dît, xist heşê xwe ew ê ji niha pê ve dev ji sefatîyê berde û dest bi etarîyê bike.

Sîpan rabû bang kebaniya xwe kir, hanî li himber xwe da rûniştandin û jê re got: "Hurmet waye tu rewşa me zanî. Aboriya me bi sefatîyê nabe, divê ez karekî din, karekî nû bikim." Jina wî lê vegerand "Tu kijan karî baş dibînî wî bike" Sîpan got: "Wela, ez işev pir fiki-riyim û min kar dît, ji wî karî re jpere lazim e û tu zanî ku perê min jîtunene, çi hebû min da sawar û sabûnê hinek deynê xwe jî min da û bi min re pere neman."

Jina wî got: "Îca çawan dibe, tu qet nikarî ji kesekî deyn bikî, heyâ paşê tu bidî wî". Sîpan siwê xwe anî û bi hêrs got: "Qey tu nizanî di vê demê de kî deyn dide kê. Hendî wek berê nine, anuha kes deyn nade kesî". Ji ber ku Sîpan hêrs bû, edî jina wî ji tırsan den-gê xwe nekir. Di nav wan de demekê kin bi bêdengî derbas bû û paşê Sîpan got: "EZ iro divê vî karî bikim. Ji ber wê yekê divê tu zêrên xwe bidî min, ez bibim bajêr hur bikim û pê qehf û qa-cax bistînim". Jina wî ya belengaz den-gê xwe ne kir û bi mirûz rabû çû odê li ber mirêkê rûnişt û hêdî hêdî zêrê de-stê xwe û ên gerdena xwe derxist û hûrik hûrik hêşir ji çav daketin xwarê. Jin hemû wusa ne, gava mêtîn wan zêrên wan ji wan distînin û hûr dikin, pir xemgîb dîbin. Jina Sîpan Nêrgiz jî ji wan jinan yekbû û pir li ber xwe diket û bi vê yekê dêşîya. Nêrgiz hember di mirêkê de li xwe mêtê kir û destê xwe da bin çengê xwe û madê xwe tehl kir.

Sîpan rabû çû hundir mêtê kir ku jina wî waye hemû zêrên xwe derxistiye û li ber mirêkê rûniştîye, hêşiran dibârîne. Sîpan çû ber wê û destê xwe da ser pêlî û xwest hinekî dil bide pê. Jê re got: "Nêrgiza min megrî, hêşirên çavê xwe paqij ke, ez ê paşê ji te ra dîsa eyni

ji wan zêran bistînim." Nêrgizê hêşirên çavê xwe paqij kirin û jê re got: "EZ ê bê zêr çawan biçim dawetan û cîranêñ me ji hemû dizanin ku zêrê min hene. Ew ê ji min pirs bikin bêjin zêrê te li ku ne, ez ê ci bersîvê bidim wan". Sîpan porê wê kir nava destê xwe û serê wê zivirand berî da aliyê xwe ûnava eniya wê maçî kir û çavê xwe kuta nava çavê wê û got: "Ma li vir li malê em bi rojan birçî bin, xwedîyê dîlanan û cîran têñ ji me re dibêjin gelo hun têr an ji birçî ne? Tu guh mede wan". Ü li ber Nêrgizê rûnişt serî wê da ser singa xwe, devê xwe xist nav porê wê û hêdî hêdî anî ber guh û jê re got: "Ax, Nêrgizam, neça-ram, belengazam, ma qey me ê ev roj ji bidîyana".

Roja din sîpan li bajêr zêrên xwe hûr kirin, tiştê ku divîya bû bibe li gundan bifroşê, stend, kir telîsan, hinekî ji di bajêr de geriya û danê êvarê lêxist hat malê, herdu telîsê xwe yêñ danîn hewşê û çû odê, mêtê kir waye jina wî odê paqij dike. Nêrgizê melkis danî paş derî û ji Sîpan re got: "Tu bi xêr hatî, te tişt stendin". "Herê, min stend, du telîs tijî kirîye, ez sibê biçim gundan wana bifroşim û dîsa bêm bistînim û bibim gundan".

"Tu nuha birçî yî, wa ye min nan pehtiye, bînim deynim, em bixwin."

"Herê wella, em nanê xwe bixwin û hela ez lêxim biçim qehwê mêtê kim ci heye, ci tine, ji ber ku ez sibkê derim, ez ê hevalekî xwe jî bibînim".

Nêrgizê anî nan danî. Sîpan nanê xwe xwar û rabû solêñ xwe kir lingê xwe û berê xwe da qehwê.

Sipan heya paşıya şevê di qehwê da ma. Hemû hevalên xwe dît. Karê nû ku dê bikira, ji wan re ji qal kir. Hevalekî wî jê re got: "Gundî gune ne. Ew jî feqîr û belangaz in tu pir ji wan qezenc neki, wan nexapîni".

Hevalekî wî yê din jî got: "Madem ku tu diçî gundan digerî kasetê teybê ên nû derketine ewan ji bi xwe re bibe bide gundiyan, ne giran in, ji te ra nabe bar". Li ser vê gotinê keyfa Sîpan hat, got: "Baş e ku te xist bîra min. Ji xwe gundi ji min xwestibûn, bide ez ê bibim".

Sîpan û hevalên wî bi hev re ji qehwê rabûn, hevalê wî çû ji malê kaset anîn

û sîpan bi rê ket û çû malê.

Nêrgiz di berbanga sibê de rabû, av da ser agir, av germ kir, çû odê, Sîpan şîyar kir û got: "Wa ye av hazır e, serê xwe jî bişo û here".

Sîpan rabû serê xwe şûst û nan xwar, dew vexwar û telîsên xwe li kerê bar kir û berê xwe da gundan.

Sîpan diçû kijan gundî jin û bûk, keç û xortê gund li ser serî top dibûn, yên ku mirêk, yên ku melhem û şe, hwd, heryekî tiştek jê dikiri. Sîpan gund bi gund digerîya û tişte xwe difrotin, kaset jî li gundiya bela dikirin. Bi vê tewrî Sîpan dest bi karê xwe kir, hercar tişte xwe li gundan difrot û dihat ji bajêr tiş distendin dîsa digit û dibir gundan. Gundên ku Sîpan diçû wan û tişten xwe li wan derina difrotin, gundek jê pir xwes û hêşinayî bû. Li pêsiya gund newaleke piçûk hebû, li wî aliye newalê li rastê ciyê mezelê gundiyan bû, li vî alîye newalê jî li ber kaniye tek mezelekî piçûk hebû û Sîpan çiqas di vir re biçûya gund, mîze dikir ku wa ye jinek ber tehta serê mezel rûnişfîye. Sîpan çend caran ew jina li ser mezel dibû, lê qet guh nedabûyê, vê carê jî dema ku di vir re derbas bû û ew dît jê re bû mereq, ji xwe ra got: "Ez çiqas têm, ev jînik li vir e. Ez ê biçim ber, jê bipirsim, ka ew mezelê kî ye".

Sîpan çû ber mezel fatihek xwend û ji jînikê re got: "Xwişka min ev mezelê kî ye? Ci yê te ye? Ez çiqas têm vî gundi, hertim te li ser vî mezeli dibînim". Jînikê xwe hinekî bi paş de da, serm kir û hêdîka bersîva wî da.

"Ev yê ha mezelê birayê min e. Gava heft salî bû cendirmê tirkan ew kuştin". Û ji serî heya dawî, kuştina birayê xwe ji Sîpan ra qal kir. "Pişti ku tevgera netewî a kurd şêx Seîd hat şikestin, ev çiyayêna ha tijî mehkûm bûn. Leşkerê romê li van çiyan û gundan li mehkûman digerîyan ku wan bigrin û bikujin. Leşkerê romê diçûn kijan gundi, pez û berxen gundiyan ji wan distendin û ji xwe re şerjê dikirin, dixwarin. Rojekê têngundê me beranekê dixwazin, gundiyan me nadin wan, gundi ji wan re dibêjin "Em feqîr û belengaz in, em wa ye ji birçîna dimirin, çend dewarê me hene em pê xwe xweyî dikin. Pez

berx û beranê me tunene ku em bidin we. Ger hûn bi zor ji me bistînin em ê hemû xwe bidin kuştinê û yan jî em ê we bikujin."

Leşker mîze dikin na, ew ê nava wan û gundiyan de şer derkeve deng nakin, lê serokê leşkeran di hundirê xwe de bi kîn û qahr dibe û difikire wê çawa heyfa xwe ji van gundiyan hilîne.

Birê min jî, ji ber kar û golikan hatîye ser kanîyê, av vexvarîye û li vê derê ji ber ku westîyaye, rûnişfîye ku bêna xwe bide. Serokê eskeran ew dîye, banî eskerê xwe kirîye û ji wan re gotîye: "Ji gundiyan re bêjin bila hemû kes biçin mala xwe û bikevin hundirê xwe, emê li vir bi çekan bavêjin nişanê, bila kes ji mala xwe dernekevî, paşê gule bi xeletî li wan kevî, eleqa çmin pê tuneye". Li ser vê gotina wî, eskeran ji gundiyan re got û hemû gundiyan ji xwe ra lêxistin çûn mala xwe û ketin hundirê xwe.

Neyarêna xwînxwar gava çend gulân ber didin, li der û dora birayê min di Kevin. Birayê min jî xwe pir behcayî ji eskeran dahatin. Radibe dibêje ez xwe bavêjim pey vî kevirî, bila derbên tifingîn wan li min nekevin.

Gava radibe ku biçe paş vî kevirê mezin, esker wî dibînin ku rabûye û ji paş de bi nava pişta wî ve didin ku tikevî erdê. Li erdê jî çend gula pê ve didin. Pişti ku birayê min tê kuştin keyfa wê sekbavê tê cî û ji eskeren xwe re dibijê "De heydin em biçin, van jundiyan berz û beran nedan me, a waye me beranekî duling kir qurban" û hemû radibin lêdixin derin. Ji wê rojê heya iro, rojê carekê xelk têng vê gorê.

Sîpan rûniştibû çıxare li ser cixarê dikêşand û guhdariya jînikê dikir, pişti ku jînik sekînî. Sîpan jê wusa pirs kir: "Çima hemû mezelê din tenê heftê carew jî şevîn ïnên têng ser wan, yê we hûn heroj têng?"

"Pişte ku birê min hat kuştin dîya min heroj dihat vir û pişti ku ew mir, wê li me wesî kiribû ku em heroj biçin ser mezel".

Sîpan got: "Herê ji bo ci heroj? Di vî ya de sedemek heye".

Jînikê got: "Erê rast e heya heyfa birayê min û wek birayê min bi hezaran şehîdên kurd, heyfa wan neyê stendin,

em ê bênen ser mezel, gava heyfa wan hat sendin wê gavê em ê edî neyê".

Sîpan ji xwe re şas ma û got: "La ew tiş ji zû ve bûye, ew esker anuha hemî jî mirine". Jînikê ji xwe re lê mîze kir û di binê lêvan de lê bişirî û got: "Na te xelet fam kir. Ew eskeren ku min ji te re qala wan kir, di wê demê de mehkûman ew kuştin, jtolvegirtina şehîdên me yên ku ez dibêjim rizgariya Kurdistane ye. Kengî Kurdistaneke serbixwe û azad çêbû wê demê tola şehîdên me tê sendin".

Sîpan ji vê bersîva jînikê pir kêfxwes bû û got: "Tu pir xwes peyîvî". Û destê xwe kir bêrika xwe kasetek derxist, dirêjî jînikê kir û got: "Ha bila ev ji te ra dîyarî be, tu carna di mal da guhdarî biki".

Jînikê bi rûkenî jî re got: "Pir sipas ji vana li ba min pir heye û ji xwe min zanibû tu jî merivekê welatparêz î, ji ber vê min ev tiş ji te ra qal kir". "Ev nû ye, ku li ba te hebe jî tu dikarî bidî yekî din" Û Sîpan kaset dîsa dirêjî wê kir. Jînikê ji dest wî girt, Sîpan xatir jê xwest ku edî biçe nava gund, di cî de hat bîra wî ku navê birayê wê û navê wê jê pirs nekiribû. Zivirî û berê xwe da jînikê got: "Bibexşîn, min ji bîr kir navê birayê te û navê te pirs nekir?" Jînikê dîsa bi rûkenî got: "Navê te Sîpan e, ew ê ku di van gundan da navê te nizanibin tunene, lê baş e ez ê navê xwe û navê birayê xwe, birayê xwes yê şehîd yê piçûk ji te re bêjim. Navê min zozan e û navê birayê min jî Xelat bû. Ji bo ku di biçûkiya xwe de pir belengaz û xweskî bû, bavê min jê ra digot Mehsûm."

Sîpan pir li ber kuştina Mehsûm ket, hêşir ji çavêna wî hatibûn xwarê, serê xwe hejand, hişê xwe hemû topkir û ji bo ku dil bida ber wê jînikâ zana û delal, jê re got: "Neyarê me hetanî iro di welatê me de pir zilm û zordesî kirine, pir merivê belengaz û Mehsûm kuştine. Tu xem nexwe, kengî be jî dê gelê me tola şehîdên me yên Mehsûm bistîne û wê Kurdistaneke serbixwe û azad çêke". Sîpan dîsa xatir ji wê jînikê xwest û berê xwe da gund

ÇI FÎL O ÇI GERGEDAN O (*)

Rojê, di Kurdê Zazay ray o şinê. Bol şinê, tayn şinê rayda xo ser o raştê balcanêda pelixnayê yenê. Na balcani zî ti nêvanêki tekerê ereba ser a şifo, biya virt û vila, dendikê ci vijayê.

Zazayandê ma ra jew, embazdê xo yê bînî ra pers keno:

-No çiçi yo?

Embazê ci vano:

-Ellah bizano no fil o.

O bîn vano:

-Nê, no fil niyo, gergedan o.

Jew vano "no fil o", o bîn vano "nê, no gergedan o", jew vano "fil", o bîn vano "gergedan". Bi qisana nêşenê çiyê pê sere kerê û werzenê xo ser û şepirnenê pê ra. Nê wirna Zazayê ma hendiki finenê pê diha edizyênê (qefilênê).

Wexta rîwiyêndo Kurmanc ray o şino, winêno ki di merdimê pê rê vanê "fil o", "gergedan o" û finenê (danê pê ro) pê. Mîrdek senî ki nezdiyê eynan beno wirna piya ci ra (ti ra) pers kenê:

- Embaz! Qandê ellay raşt vaji, no fil o, gergedan o?

Mîrdek winêno balcanda pelixnayê ra û vano:

-Ez nêşena çiyê vaja. Labirê, ki ez ba, ma do ney bigîrê şirê dewi miyan. Dewi di kal malê ma estê. Ma eynan ra pers kerê hele ê se vanê.

Nê hîrê heme mîrdekî balcana pelixnayê gînê û şinê dewi miyan û derdê xo kalan rê vanê.

Çihar-panj kalî arêbenê balcanê ser. Letan û dendikanê balcanê a ta na ta lûnenê, boy kene, pif kenê û dim a vanê:

-Ganî (gerek) ma şirê zere û xo miyan di muşewre bikerê.

Kalî şinê zere. Xo miyan di muşewre kenê. Qisanê xo kenê jew û nîm saet tepiya vijênenê teber û vanê ma qerar dayo ki:

*Çi fil o, çi gergedan o,
No bilbilê qefesan o.
Gilgil werdo, pa merdo.*

Nîse:

(*) Mi na mesela, 8.4.1990'ı di, Danîmarka difektî Behzat Xocay ra nûsnaya. H. Diljen

Şaşeyê hûmarda 66'ı

Semedê xetayêndo teknikî ya, hûmarda verini di zaf şaşey estê. Yaziyê hûmarda verêni, bi dataya nûseyay tepiya ma rest kerdi. Labirê wextê mîzanpjî, embazan bi şaşeya dîsketo verên, yanê raştnebiyaye bi kar ardo. Bi no semeda nûşteyê ma bi xeylê şaşeya vijayê. Şaşey winî zafê ki ez nêzana ma kamcînî raşt bikerê. Vanê devî rî vatê "o milê to cirê winî çewt o". Devî vato, "ma kotiyê min raşt o ki." Mesela şaşeyandê hûmarda 66 zî wina ya. Labirê fina zî ma wazenê çend şaşeyanê muhîman raşt bikerê:

1- Yaziyê H. Diljenî, riper 36, stûn 1, paragrafo peyên, rîza didini ganî wina bidomeyo "... biriço mintiqa ki xo rî Emerîka, Jabonya..."

2- Eynî yazi, stûn didi, paragrafo sifteyên rîza didini

(rîza ki bi "zaf gîrd" .. a dest pa kena) ganî wina bidomeyo, "zaf gîrd meselada Kurdistanî ser o bikero. İftîmalêdo zaf gîrd a"

3- Riper 38, namedê Selim Keyay bindi, paragrafo sifteyên, rîzda çîharf di, kelîma da "bivîjiyê" dima ganî nîxta bibo û nîxta dima zî ganî cumla wina dest pa bikero "Ki ma Seddamî ver nêvîjiyê..."

4- Riper 38, paragrafo peyên, è qisandê Timûrê Xelîli di, rîzda 3 (hîrini) di, cumla ki bi "Ki ya dest pa kena, ganî wina bo: "Ki erdê Kurdistanî herbî ver nêkewtê, ma do fina zî bivatê we qe herb bivîjiyo. Ez fina vana..."

Qandê nê şaşeyan ma şima ra efê xo wazenê.

Berbang

Arêkerdox: H. Diljen

FOLKLORDÊ ÇORŞMEDÊ MADENÎ RA ÇEND NIMÛNEY (*)

DAYO MÎRO

Ding dingo banî ser o
Tembûrê zoniyan ser o
Verg yeno tûskî bero
Emoyê Qijoy se kero

Va yeno vayê verî
Leqneno zulfey verî
Hol keno orxan serî
Dayê mîro to rê vana

ÇEND HEVALÎ (1)

Vayo pako cir ra yeno
Neftay derdê ma leqneno
Hevala veyver ser erzeno
Şarê dinyay ma hûwiyeno

Çi hûwiyena ci bermenâ,
Qowim şîrin o terk nêkena,
Way hevalê şîrina malê

Verê bandê heval kort o,
Dalpan te de şirte şit o
Heval meberm zoma xort o

EMI

Na Ema berî ver o
Giley sûrî zoniyan ser o
Ez şêrî kom to bero
Derba Hecî xençer o
Xençer û debançer o

Emê hadê to berî
Heta mîrdey to bîro
Ti bena zeydê verî

Ma şêrim Hemda reşî
Ma ra yena boyâ weşî
Çim kena ti biveşî
To kena qulda heşî
Heyranê gon û leşî
Qandê to bena nêweşî

Ti keyna keyna mîran
Engura rezdê hîran
Werdişê kal û pîran
Toleyê şerdê sîtilan

(*) Nê nimûney min fekdê Bêzarda Keleliyan ra Nûsna yê.

(1) Zazayê çorşmedê (dormedê) Madenî, vexto ki kenê veyveri dewda pêrdê ci ra vejê, anê inidê dewi ser. Înidê dewi ser o. Veyveri ser ra çîtênda girdi akenê. Kişa zamay ra didi û kişa veyveri ra zî di cinî koşanê çitî tepêşenê û hevalî vanê. Nê hevalê ki ma cor di nûşte zî nimuneyê nê hevalan e.

Maden: Qezayênda Elezîzî ya

ber: kêber

zonî: saqey, çogî

tole: qeymax

Hemi: Nezdiyê Sîwrice, nameyê ziyaretê no

şerî: şirî

XIM XIMI

1.
 Xim Xima Silêmanî,
 Xim Çeyna Silêmanî,
 Riwenê serdê nanî,
 Piranê bindî zonî.
 Germo çinca amnanî,
 Ca çinyo lewê panî,
 Wa vindo gomda şanî,
 Madeno bê fermanî,
 Honik o serê banî,
 Heyranê Xim û ganî.

2.
 Xim Ximê ast û naşta,
 Kembero kışta raşa
 Ti vanê min viraşa.

3.
 Ti Xima şardê astî
 Tifingê xortan raştî
 Kalan erdişî taştî
 Xim biskê xo viraştî.

4.
 Ver bandê ma balcanî
 Pey bandê ma balcanî
 Balcanê Erzinganî
 Xim ana bixça nanî

5.
 Xim Ximê to rê vana
 Xirabîno to nêvana

Rindîda to rê vana
 Ti rinda co ra vana
 6.
 Xim Ximê to rê vana,
 Siya çiman kay dana,
 Delîla ser xortan a.

piran: loqme, parî
zon: ziwan
çinci: tîjî
çeyna: keyna

ÊKIL O(*)

Ekil o
 Di nêkil o
 Çara çim a
 Biska Xim a
 Ala ving a
 Bê quling a
 Taştî şiya
 Çek boynî ya
 Vistiki ya

(*) Wexto ki qeçkan (gedey, domanî, qîjî) hewna dest bi
 kaya nêkerdo, qisanê winasînan vanê ki bizanê kam do
 dest pa bikero.

1) Dêzayê ximximî
 Pirrê nanê genimî

2) Kelomeyê çewtî
 Peydê hewt koyan di kewtî


3) Sinî ser sinîk
 Veng şî Wiseynik

4) Çiyêdê min est o
 Bano jê estûnî ser o

